

K.T.

ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

BEŞA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

NAVÊ TEZÊ

GUHERÎN DÎ ASTA DENGSAZÎYÊ DE

-WEK MÎNAK DEVERA AMÊDÎYÊ -

LÎSANSA BILIND

AMADEKAR

Tahseen Mamo Aziz Aziz

ŞÊWIRMEND

Doç. Dr. Nesim Sönmez

VAN - 2019

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

TEZİN ADI
FONOLOJİK DEĞİŞİM
-AMİDY ÖRNEĞİN-

YÜKSEK LİSANS

HAZIRLAYAN
Tahseen Mamo Aziz Aziz

DANIŞMAN
Doç. Dr. Nesim Sönmez

VAN - 2019



T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ danışmanlığında, Tahseen Mamo Aziz AZIZ tarafından hazırlanan “Guherîn Di Asta Dengsazîyê De-Wek Mînak Devera Amêdiyê-” adlı bu çalışma, 06/09/2019 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman) : Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

İmza: 

ÜYE : Doç. Dr. Mahmut DÜNDAR

İmza: 

ÜYE : Dr. Öğr.Üyesi Mazhar TUNÇ

İmza: 

ÜYE :

İmza:

ÜYE :

İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylım.


Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ
Enstitü Müdürü Vekili


(Lîsansa Bilind)

Tahseen Mamo Aziz Aziz

ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

Eylûl - 2019

(GUHERÎN DÎ ASTA DENGSAZÎYÊ DE

- WEK MÎNAK DEVERA AMÊDÎYÊ -)

Kurte

Ew jîngeha ku em lê dijîn, gelek deng dihêne bîstin weke dengên bûyerên xwezayî û deng û pêjinên boneweran, li vir de dema em behsa çemkê dengî dikeyin merema me ew deng nînin ewên ji dîyardeye û xwezayê derdor tîn bîstin, lê belê merema li vir de dengên zimanê mirovî ne, ewê mirov pê di peyvît. Li cîhanê dengên zimanê mirovî gelekî, her zimanek li gor xweza û pêkhatiya xwe komeka dengên ji ewan dengên gelemperî werdigre.

Deng, ew yekeya zimanî ye dema diçe dinava piroseya axiftinêde dibe yekeya bûnyatnana zimanî, li dema bikaranînê ji alîyê xelkî ve hinek guherîn bi ser evan dengên de tîn, ew jî jiber çend egerên dîyrkirî, ev eger jî dabeşî dû cûreyan dibin a yekê: egerêt ne zimanî ne weke egerên ramyarî, cografi, olî û koçkirin. Û duyem: egerêt zimanî ne weke egerên guncan, neguncan, ji navçon, cih guherîn û peyda bon. Di dengên zimanî de rû diden. Lê ev guherîne di piroseya zimanîde dîyardeyeke normale, ji ber ku weke di sadetirîn pênaseya zimanî de tê zanîn ku, ziman asantirîn rêke ji bo lêk têgehiştina xelkî, avca dema ew guherîne di asta dengsazîyê de rû diden, bandorê li merem û armanca zimanî nahê kirin, ku ew jî lêk têgehiştine, û ew dîyardeya guherînê ji alîyê zimanvanan ve û ji alîyê xelkî ve bi awayeke normal tîn temaşekirin.

Ev vekolîne li ser guherîna asta dengsazîya zimanê Kurdî hatîye kirin, di vekolîna xwe de me vîya ye ewê dîyardeya guherîna dengên zimanê axiftina xelkî bi awayeke rêk û pêk şirûve bikeyn, ka ew deng çewa hatîne guherîn? Û egerê ewan guherînan çine? Li gore wan guherînan nebe wateya xweriskî a peyvê bê guherîn. Ji

bo pitir selimandina encamên vekolîna me, me mînak ji axiftina rojane a xelkê deverdarîya Amêdîyê wergirtîne.

Peyvên Sereke : Guherîna dengan , Deng , Tîp , Fonîm ,dengdar, dengdêr, Guncan , Neguncan.

Hejmara Rûpelan : 90

Şêwirmend : Doç. Dr. Nesim Sönmez



(Yüksek Lisans)

Tahseen Mamo Aziz Aziz

**YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**

Eylül - 2019

**(FONOLOJİK DEĞİŞİM
-AMIDY ÖRNEĞİN-)**

ÖZET

Yaşadığımız dünyanın içinde normalde doğal olayların sesleri ve yaratıkların dinlenmesi gibi birçok ses duyarız. Burada ses kavramının amacı, çevreden duyduğumuz doğal sesleri değil, insanların ürettikleri sesler ise birincil amacı ifade eder. İnsanın çok çeşitli fonetik sesleri vardır, her dil, konuşulduğu çevreden özel sesler alır.

Ses, konuşmaya katılımı esasen üretken dil birimi olan, insanlar tarafından kullanıldığında, dil birimidir; belirli nedenlerden dolayı bazı değişikliklerden geçiyorlar. Bu değişiklikler iki türe ayrılır: birinci sebep politik, coğrafi, dini ve göçmenlik gibi dilsel değildir. İkincisi, daha güçlü, hızlı konuşma ve tekrarlama yasası gibi dilsel olanıdır. Yukarıda belirtilen sebepler fonolojik düzeyde değişikliklere yol açmaktadır. Bu fonolojik değişiklikler aşağıdaki gibidir: asimilasyon, disimilasyon, ihmal, takas etme ve ekleme. Bu değişiklikler doğal olarak kabul edilir, çünkü dilin en sade tanımında bilindiği gibi birbirini anlamının en kolay yoludur. Dolayısıyla, bu tür fonolojik değişiklikler meydana geldiğinde, dilin amacını ve mesajını etkilemezler. Dilbilimciler ve normal insanlar bu değişim fenomenini normal olarak kabul ederler.

Bu araştırma, Kürtçenin fonolojik değişimlerinin seviyelerine ilişkin olarak yapılmıştır ve çalışmamızda, fonolojik seviyedeki değişiklik olgusunu doğru bir şekilde açıkladık. Bu sesler nasıl değişti? Ve bu değişikliklerin nedenleri neler? Sesbilimsel değişimlere göre, kelimenin doğal anlamı değişmez. Çalışmamızın sonuçlarını daha da doğrulamak için, Amedy bölgesi halkının konuşma örneklerinden aldık.

Anahtar Kelimeler: Fonolojik Deęişiklikler, Ses, Harf , Fonem, Sesli Harf, Ünlü Harf, Asimilasyon, Disimilasyon.

Sayfa Sayısı: 90

Tez Danışmanı: Doç. Dr. Nesim Sönmez



(M.Sc. Thesis)

Tahseen mamo aziz aziz

**YÜZÜNCÜ YIL UNIVERSITY
INSTITUTE OF LIVING LANGUAGES**

September - 2019

**(THE CHANGE IN THE LEVEL OF PHONOLOGY IN
-AMEDY AREA FOR EXAMPLE-)**

ABSTRACT

In the world we live in, we normally hear many sounds such as the sounds of natural phenomena and the tapping of creatures. Here the purpose of the concept of sound does not embody natural sounds we happen to hear from the surrounding, but the primary purpose is the voices produced by human beings. There are a great variety of phonetic sounds of human beings; every language adopts specific sounds from the environment it is spoken in.

Sound is the unit of language the involvement of which in speech becomes the fundamentally productive unit of language, when these sounds are used by people; they undergo some changes due to some specific reasons. These changes are categorized into two types: the first reason is non-linguistic such as political, geographical, religious, and immigrating reasons. The second is linguistic one such as law of the stronger, rapid speaking, and repetition. The aforementioned reasons lead to changes at the phonological level. These phonological changes are as follow: assimilation, dissimilation, omission, swapping, and addition. These changes are deemed natural because, as it is known in the plainest definition of language, it is the easiest way to understand one another. Thus, when such phonological changes occur, they do not influence the aim and message of the language. Linguists and normal people consider this phenomenon of change typically normal.

This investigation has been conducted on the levels of phonological changes of Kurdish language, and in our study, we have accurately explained the phenomenon of the changes at the phonological level. How have these sounds changed? And what are the reasons behinds these changes? According to the

phonological changes, the natural meaning of the word does not change. To further certify the results of our study, we have taken samples of speech of the people of Amedy district.

Key Words: Phonological Changes, Sound, Letter , Phoneme, Consonant, Vowel, Assimilation, Dissimilation.

Quantity of Page: 90

Supervisor: Doç. Dr. Nesim Sönmez



NAVEROK

KURTE	I
ÖZET	III
ABSTRACT	V
NAVEROK	VII
LÎSTA KURTEBÊJEYAN	X
PÊŞGOTIN	XI
DESTPÊK	1
BEŞA YEKEM	2
1. DENG Ê TÎP Ê FONÎM	2
1.1 Deng	2
1.1.2. Têgehê Dengî	2
1.1.3. Dengên Zimanî Weke (Zarav)	4
1.1.4. Têgehê Dengên Zimanî	5
1.1.5. Pênaseyên Dengî	5
1.2. Tîp	6
1.2.1. Pênaseyên Tîpê	6
1.3. Fonîm.....	7
1.3.1. Têgehê Fonîmê.....	7
1.3.2. Pênaseyên Fonîmê	7
1.4. Fonîm û Elofon.....	9
1.5. Dengên Zimanê Kurdî	11
1.5.1. Cureyên Dengên Zimanê Kurdî	12
1.5.1.1. Dengên Dengdar (Nebizwên) (CONSONANTS).....	12
1.5.1.2. Pênaseyên Dengdaran	12
1.5.2. Dengên Dengdêr (Bizwên) (VOWEL)	13
1.5.2.1. Pênaseyên Dengdêran	13
1.5.3. Dengên Nîmçe Dengdêr (SEMI VOWEL)	14
1.6. Dengên Kip û Dengên Gir	15
1.7. Pulîn Kirina Dengdaran	16
1.8. Pulîn Kirina Dengdêran	17
1.9. Deng û Guherîn	18

1.9.1. Çemkê Guherînê Di Zimanê De.....	18
1.9.2. Taybetmendiyên Guherîna Dengan	19
1.9.3. Guherîn Di Asat Dengî De.....	20
1.9.4. Beşên Guherîna Dengan	21
1.9.4.1. Guherînen Dîrokî	21
1.9.4.2. Guherînen Pêkhatayî.....	22
1.9.5. Sedemên Bandorê Di Guherîna Dengî de Diken	22
1.10. Hekarên Guherîna Dengî.....	24
1.10.1. Hekarên Nezimanî	24
1.10.1.1. Desthilata Remyarî û Serbazî	24
1.10.1.2. Hekarê Ayînî(Olî).....	25
1.10.1.3. Hekarê Derûnî	26
1.10.1.4. Hekarê Cografî	27
1.10.1.5. Hekarê Mişextbûnê(Penaberî).....	27
1.10.2. Hekarên Zimanî	28
1.10.2.1. Yasaya Dengê Bihêz.....	28
1.10.2.1. Hekarê Lezkirinê Di Axiftinê De	28
1.10.2.2. Hekarê Dubarebûnê	28
1.10.2.3. Hekarê Asan Bûnê û Bandora Wê li Ser Guherîna Dangan.....	29
1.10.2.4. Hekarê Bandora Zimanê Dewrûber Li Ser Zimanê Kurdî	29
1.11. Yasayên Bandora Zimanî	30
BEŞA DUYEM	32
2. Guherîna Dengan Li Nava Axiftinkerên Devera (Amêdîyê)De	32
2.1. Kurtîyeke Dîrokî Li Dur Devera (Amêdîyê).....	33
2.3. Guherîn Di Dengên Dengdêr (VOWEL) De	37
2.3.1. Peyda Bûna Dengî.....	37
2.3.2. Ji Nav Çûna Dengî	37
2.3.3. Yekbûna Dengî:	39
2.3.4. Pêk Guherîna Dengan:	40
2.4. Guherîn Di Dengên Dengdar (CONCONANT) De	44
2.4.1. Guncan_ ASSIMILATION.....	44
2.4.2. Neguncan_ DISSIMILATION.....	51
2.4.3. Peyda Bûna Dengan	52

2.4.4. Pêk Guherîna Dangan	55
2.4.5. Cih Guherîna Dangan _ EXCHAN	60
2.4.6. Ji Nav Çûna Dangan _ DELETION.....	62
ENCAM.....	71
ÇAVKANÎ.....	73
XIŞTE.....	79
HÊLKARÎ.....	80
NEXŞE	81
JÎYANNAME



LÎSTA KURTEBÊJEYAN

K.T.	Komara Turkîya
T.C.	Turkiye Cumhuriyeti
D.A	Devoka Amêdîyê
D.Din	Devokên Din
//	Nîşanya Dengî
()	Nîşanya Tîpê
[]	Nîşanya Fonîmê
Htd	Heta dewîyê
Ç	Çap
Çx	Çapxane
Weş	Dezgehê Weşanê
Wer	Wergêran

PÊŞGOTIN

Ziman dîyardeyeke civakîy e, rêyeke bo gehandina peyamê, ziman pirûsiseke sade nine, ziman kumeka dengaye dihêne lêkdan bû yekeyên mezintir weke (birge, peyv, girê), da kû wate bihê gehandin. Zimanvanan dû boçûn hene ji bo vekolînên zimanî, hinek ji wan ji dengî vokolînê diken ta digehin morfolojîyê û sîntaksê, û hinekên din ji yekîneyên mezin ji asta sîntaksê vokolînê diken ta digehin astên biçûk ku ew jî denge, anku vokolîn bi çi awayekî be bihayê dengî xweya dibe. Yasayên dengî ji zimazek bû zimazeke din ji dîyalîktek bû dîyalîkteke din dihête guhertin, guherîna fonolojîyê pişkeke ji guherîna zimanî, aya ev guherîne çawa drust di be ? ji bo bersivdana vê pirsê, pêdvîye di nava hurkarîyên fonolojîyê de bo mînak jêbirin û guhertina dangan di peyvê û birgê de guhertin çêdibin weke: (Rêk __ Rê) tîpa (k) ya hatîye jêbirin , û gelek yasayên din bi vî awayî hene sebare (cûr , hijmar , cî) fonîman di nava birgeyê de bi têt û tesel dê di vekolîna xwe de xweyakeyn. Ziman jî weke hemû çalalakî yên din ên mirovî weke xwarin û vexwarin û nivstin , bi kiryareke asayî têt danîn. Ziman komeke dengane ji bo derbirîna hizran têt bikar anîn, bi awayeke serekî ziman pişt bi dengî dibestît, ji ber vê yekê vekolîna dangan karekê zor fere bo têgehiştina dîyardeya zimanî û dîsan rêekeke mifadare ji bo têgehiştina kiryara wergirtina zimanî.

Yasayên dengî yên her rêzmanekê hêmayên sereke û dengên her hevokê di zimanî de xweya dikin, yan bi awayeke din yasayên dengî, formên dengî yan çewanîya bilêvkirina hevokên zimanî xweya dike û rûyê jîderve yê hevokê bi awayekê dengî yê rêk pêk xweya dike, ku rûyê jîderve yê hevokê bi awayê axiftinê dide xweyakirin û digehîne layenê beramber.

Nav Û Nîşanê Vekolînê

Nav û nîşanê vekolîna me pêk têt ji (Guhêrîn Di Asta Dengsazîyê De - Wek Mînak Devera Amêdîyê -).

Mebesta Helbijartina Vê Vekolînê

Rengvedana bûyerên fonolojîyê û axiftina devera Amêdîyê de, kersyên vekolînê dê ji axiftina rojane a axiftinkerên devera xweyakirî êne wergirtin. Govera behdînî dikeve di nava dîyalîkta kirmancî ya jorî ya zimanê Kurdî , û ev govêre ji

çend devokên cuda cuda pêk tê, her yek ji wan xwedî çend taybetmendî ye, ev taybetmendî ye rêzmanî û dengî ne, di bin egerê cudahiya wan devokan, girîngîya vekolîne dîyarkirina guherînen fonolojîyê ne, ka ew guherîne çewan peyde dibin, ji ber wê yekê me bi fer zanî vekolîne li ser vê mijarê encam bideyin.

Materyalîyal Û Rêbaz a Vekolîne

Ji bo pêdvîya vekolîne û gehîştin bi encamên rast, dê rêbaza (wesfî) şîkarî bi awayê piraktîk (karekî) bikarînin, û vekolîna me wê li ser awayê meydanî bê encam dan, mînakên xwe di ji axaftina rojane a xelkê deverê wergirîn.

Dê pêkolê keyn vê vekolîne di du beşan de encam bidîn, di beşa yekem de aliyên tîyurî ên dengî dê êne behskirin, di beşa duyem de dê bi kurtî behsa mêtîyaya Amêdîyê û cihê wan di nexşeyê cografîyê de keyn, dê behsa guherînen dengî keyn bi awayeke piraktîk.

Sopas bo zanîngeha wan yûzûncû yilê enstîtuya zimanên zindî ji bo ku delîveya xwandinê daye min. Sopas bo Doç. Dr. Nesim Sönmez ku şewermendîya vê tezê bi stuyê xwe ve girtî. Sopas bo Dr. Şêzad Sebrî Elî serokê pişka zimanê Kurdî li zanîngeha Duhok jo bo hevkarîya wî digel min. Sopas bo tevaya endamên malbata min bi taybet heval û hevîna min ji bo hevkarîya wan digel min.

DESTPÊK

Zimanvanî zanisteke, ku li hemî alîyên (deng, morfîm, hevok, derbirîn, wate, derûn, civakî, ferheng û piraktîze kirina zimanî) bi xwe ve digre.

Zanistê zimanî, ew zaniste giringîyê bi çewanîya bikaranîna zimanî ji alîyê xelkî ve, peywendîya zimanekî bi zimanên din ve û werara zimanî, bandora civakî li see zimanî û bandora zimanî li ser civakî, peywendîya zimanî bi zaniest û biwarên din ve dide. (Ebdullselam Necimeddîn Ebdulla û Şêrzad Sebrî Elî, 2011, 23). Her vekolîneka derbareyî zimanî tê kirin dibe cihê giringîdana zanistê zimanî ve.

Zanîn û haydarbun li ser pêkhateyên zimanî, hebuna pêzanînane li ser astên zimanî, ziman ji çend astan pêk tê û her astek ji du pêkhênên taybet pêk tê, anku bi awayekê gelemperî ziman ji sê astên sereke pêk tê, ku ziman li ser tê avakirin û her yek ji wan astan dabeşî du pêkhênên taybet dibe, weke vî awayê jêrî:

- 1- Asta dengsazî: ji (fonetîk, fonolojî)yê pêk tê.
- 2- Asta rêzmanî: ji (morfolojî, sîntaks)ê pêk tê.
- 3- Asta wateyê: ji (sîmantîk, piragmatîk)ê pêk tê. (Peyman Musa Sadî Bîrî, 2016 : 49).

Beşa asta dengsazîyê dibe kakilkê vekolîna me.

Dengsazî tayeke ji zimanvanîya nû, giringîyê bi vekolîna ewan dengan dide, ewên rolê wate guherînê dibînin, herwisan bi sîmayên ewan yên cudaker û ew peywendîya di navbera wan de, herwisan bi sîstemê dengî ji alîyê wesfî yan dirokî ve dide, herwisan dengsazî rêbaz û rêkên xwe yên taybet ji bo ravekirina sîstemê dengî yên zimanî hene. (Ebdullselam Necimeddîn Ebdulla û Şêrzad Sebrî Elî, 2019 : 9).

Beşa Yekem


1. Deng û Tîp û Fonîm

1.1 Deng

1.1.2. Têgehê Dengî

Deng ewe yê me guh lê dibe û hest pê dikeyîn. (Remezan Ebdulltewab, 1997 : 84). Li daristan û çîyayan û mal û kolanan em dengên cur bi cur dibihîzîn. Ev pêjna gav avêtina mirovane, awaz û dengên balindane yan jî xişxişa pelên weşyayî ji darane, xurxura ava kanîya û robarane, ji wan dengan ji bêjeyên sazîrî dihên cudakirin. (Bavê Nazê, 2012 : 17). Wate her dengê ku em bi guhî di bihîzîn, bi deng tê hijmartin, li vir de amaja me bû dengî bi awayeke gelemperî ye.

Zanayan cudahî di navbera du cûreyên dengan de kirye, cûreyê yekem: Dengên xwezayî ne ku ji bûyereke xwezayî peyda dibin. Weke birîsîyan û şîrşira avê û dengên dar û baran.....htd. Bi derbirîneke din ew bûyerên xwezayî dengê peyda diken û ev denge ji xwezayî peyda dibin. Cûreyê din ji encamê mebestekê peyda dibin, weke dengên ji mirov û gîyaneweran û hişyarkeran peyda dibin, ku bi dengên destkird tên bi nav kirin. (Ebdullselam Necimeddîn Abdulla û Şêrzad Sebrî Elî, 2018 : 75). Û dengên destkird jî dabeşî du cûreyan dibin ew jî dengên amîrî û dengên fisyolojî endamî ne, dengên amîrî weke ewan dengên ji livîn û hişyarker û amîrên muzîkê peyda dibin. Lê belê dengên fisyolojî endamî ew dengên ewên ji leşekî peyda dibin, ku xwîn û goşt hebît. Her dîsan dengên fisyolojî endamî jî dabeşî du liqên din dibin ew jî dengên mirovan û dengên gîyaneweran e, û dengên mirovan jî li ser du cûreyan dabeş dibin ew jî dengên zimanî û dengên nezimanî ne.(Îsa Wazih Hemîdanî, 2015 : 51). Di şêyan daye ev çena burî di evê hêlkarîya xarê de xweya bikeyn:



hêlkarîya 1 dengên zimanî û ne zimanî

Anku bi awayeke gelemperî du zarav dê hêne ber singê me ew jî dengên zimanî û dengên nezimanî ne. Wate ew dengên ji endamên axiftinê li dev mirovî peyda dibin weke lêv û didan û gewîhtd. Drust dibin û ew denge nabin binyat bu durstkirina zimanî; ji ber ku dengin dihêne lêkdan û dibine birge û peyv û hevok. Lê belê dengên ne zimanî berûvajî vê çendê ne û pişikdarûyê di çêkirina zimanî de naken, wate ji bilî dengên zimanî her hemî dengên din nezimanî tên hijmartin.

Zimanê axiftinê yê mirovî ji çend dangan pêk têt, ku ewan bi serê xwe wate nine, lê belê dema kû pêkve digel dengên kom biken, bu pêkînana wan yên kû wate hey.(Bêrnard Kemrî û yên din, wer: Kamîl Mihemmed Qeredaxî, 2007 : 13). Bu mînak (D , A , R) çend dengekin ku her yekê bi tenê wate nine, lê dema kom dibin, dibine (DAR) wateyê diden.

Sererayî vê çenda li serî jî, ku dengên mirovî dengên zimanîne, lê di şêyan dayê dengên mirovî ji bibin dengên nezimanî, bo mînak ew dengên ji encamê êşanê û xem û nexweşîyan ji mirovan peyda dibin weke (qîjî û nalîn û hewar û gazîkirinhtd). (Ebdullselam Necimeddîn Ebdulla û Şêrzad Sebrî Elî, 2018 : 76). Karê me di evê vekolînê de şiroverkirin û danenîyasîn û dîyarkirin û guherîna dengên zimanî ye, wate tenê dengên zimanî dê bibin kakilka vekolîna me.

Herwesa gelek ji dengên mirovan ewên ku nehên hijmartin ji dengên zimanî di hinek zimanan de dihêne hijmartin ji dengên zimanî. Bo mînak ew dengê em dertêxîn daku zilkê şixartê pê vemirînîn yan dengê maçê yan dengê gazîkirina

dewarekê eve hemî dibin beşek ji keresteyên dengên zimanî di zimanî Japonî de. (Maryo Pay, 1998 : 45). Anku dengên zimanî û dengên nezimanî jî di zimanekî bo zimanekê din cudane. Dengên zimanî jî ji alfyê zimanvanan ve wek hewildanek ji bo dest bi serdagirtinê hatine parvekirin bû dengên (VOWEL) û (CONSONANT) û (SEMI VOWEL), û hinek layen û beşên din weke (Peqînekî (PLOSIVE)) û (Lêk xişan (FRICATIV)) û (Layî (LATERAL)) û (Gir (VOICED)) û (Kip (UNVOICED)) (Diyar Ebdullkerîm seîd Halo, 2011 : 19). Dê hewil deyn di vê vekolînê de bi dirêjî behsa vê polîn kirin û dabeş kirana dangan keyn.

Demê me guh li axiftina zimankî dibît û em wî zimanî nezanîn; weke haş hûşekê tête guhêt me, em nizanîn li kîj cihî peyv dest pêdîket û li kîve bi dawî tê, heta ku em vê çendê jî nazanîn em ramana hevokê jî nizanîn. Li dema bikarînana zimanî ji bo axiftinê yan têgehiştinê, ew dengên tîr berhenhênan yan guhlêbon dihêne girêdan bi sîstemê zimanî ve bo hinek ramanên taybet, her kesekê zimankî bizanît, dê zanît çi deng di ewî zimanî de hene û çewa di gel hev diguncin û ev li dîvhev hatina dengên cuda çi raman diden. (Elî Muhemmed Heq Şnas, 1383/2004 : 12-13).

1.1.3. Dengên Zimanî Weke(Zarav)

Zaravê dengên zimanî di zimanê Erebi de bi (الصوت اللغوى) tê binavkirin û di zimanê Îngilîzî de dibêjnê (Phone). (Ebdullselam Necimeddîn Ebdulla û Şêrzad Sebrî Elî, 2018 : 76). Hinek çavkanîyan zaravê deng (Sound) li cihê dengên zimanî (Phone) bikar tînin, lê eve heta radeyekî dibe tem û mijî ji bo xwendevanî, ji ber ku zaravê deng (Sound) zêdetir deng bi awayeke gelemperî ne, lê zaravê dengên zimanî (Phone) taybetîtire, ji ber ku bi tenê ew dengin ewên ji endamên axiftinê drust dibin. (Remzî Munîr Belebegî, 1990 : 462). Ji ber vê çendê ya pêtvîye zarav ji hev bîr cudakirin di vekolînê de. Çunkî zaravên (Deng, Sound, الصوت) ji bo hemî dangan bi gelemperî tîr bikaranîn, lê zaravên (dengên zimanî, Phone, الصوت اللغوى) taybetin bi ewan dengên di nava zimanî de tîr berceste kirin, ya giring ewe di vê vekolînê de her cihê ku me zaravê (deng) bi tenê jî bikaranîbe merema me dengên zimanî ne. Ji ber ku mebesta me tenê ew dengin ewên zimanê axiftinê drust diken.

1.1.4. Têgehê Dengên Zimanî

Babetê dengî ewe ku girîngîyê didete vekolînên dengên zimanî, ji alîyê wesfa cihê derkeftina wan, çewanya rudana wan, sîfetên cuda cuda ewên deng pê dihête vavartin, herwisa vekolînê li ser wan yasayan diket yê ku bandorê li ser van diken, û bandora wan li ser hev du li demê peyvan û hevokan pêk dihînin. (Remezan Ebdulltewab, 1997 : 13). Ziman li ser binçîneya derbirîna dengan hatîye damezrandin, ji ber ku hemû ziman berî nivîsînê deng bon, û bi evê jî bi rêka dengî wate û mebest gehandîye guhdarî yan kesê beramber. (Maryo Pay, 1998 : 166). Ev boçûne bo wî yekê vedigerît ku her ji kevin de gelek zimanvanan hizra hindê kirîye ka çî cure peywendîyek di navbera deng û zimanî de heye, eve jî destpêka vekolînên zimanî bon, ku her ji kevin de du ast bo zimanî destnîşan kiribûn (deng û wate). Paşê vekolînan eve jî dana ber çav ku dibe hinek astên din hebin bo zêdetir ronkirina (deng û wate)yê ew jî astê rêzman bo (Fonolojî û Sîntaks).

Ji alîyêke din ve Dî Sosêr eve ya vebirî ku çî peywendîyê sirûştî di navbera deng û wateyê de nîne, ji ber ku peywendî di navbera deng û wateyê de peywendîyê xwezayî ye û civak drust diket (anku civak biryarê li ser dide li gor sîstemî). (Bazyar Yonis Mihêddîn, 2013 : 88).

1.1.5. Pênaseyên Dengî

Deng: Ew pêjine, ewa ji pêlên livokên ba(hewa)y payda dibît û guh dibhîzît. Û her dengêkê ku mirov dertêxît meremek pê heye. (Fazil Omer, 2004 : 27).

Deng: Bi rêya endamên axiftinê tê derbirîn, bi hoyê bihîstinê hest pê dikeyn. (Nerîman Ebdulla xoşnaw, 2013 : 13).

Crystal. D (1992 : 298) dibêje: Fon yan dengên zimanî biçuktirîn yekeya cudakere a hest pêkirî a dengîye dinava axiftinê de.

Fînç. G (2000 : 62) dibêje: Fon keristê bineretîye bo axiftina me, bê ku em amajê bideyn wateya peyvan.

Ewrehmanê Hacî Marif (1986 : 82) dibêje: Deng ew keresteya zimanîye ewa bi rêya endamên bilêvkirinê tête derbirîn û bi rêya endamên bihîstinê hest pê tête kirin.

Ji evan pênasayan bo me dîyar dibe ku dengên zimanî, ew dengî ewên ji axiftina mirovî bi dset ve tên û ji endamên bilêvkirin û dirkandinê drust dibin, û deng tê hijmartîn biçuktirîn yeke a zimanî ku em di karîn hest bi hebûna wê bikyn.

1.2. Tîp

Gelek kes deng û tîpan ji hev cuda naken, bo ji hev cuda kirina wan dê vê ronkirinê deyn, tîp ewe ku bê nivîsîn, anku wêneyê nasîna xelkî binivîsîna destî, tîp tişteke (maddî)ye yan şikleke hendesî ye, her kesekê xwendinê û nivîsandinê bizane wêne diket, herwisan jê fam diket, lêbelê deng ewe ya tê gotin, û bi çavan hset pê nakeyn, bi guh lêbûnê hest pê dikeyn, deng nahêt dîtin ji ber ku pêlên dengî ne ji alyê amîrê dengî ve têt berhemînan û şandin. (Şebil Ewde Ebdulla ELluham, 2010 : 27).

Zimanê devkî yan axiftin gelek dibera nivîsînê hatîye, anku maweyek zor dirêj ku em nizanîn çende, mirov yê jîyay û di axiftin berî amîrekê tomarkirinê hebît bo veguhastina van axiftina ji bo kesianên din. Nivîsîn dahênanekê nû ye li gor dîroka mirovan. (Kemal Beşer, 2000 : 630).

Tîp destewajeyê têt bikaranîn ji bo sîstemê wênekirina dangan û axiftine bo nivîsînê, ya ku em di jîyana xwe a rojane da bikartînin. Li destpêkê wêne dihatin bikaranîn, anku her wêneyekî derbirîn ji axiftinekê dikir, lê piştî borîna demî guherîn û rastvekirineke zor nivîsînê piştî xwe bi tîpan best di zimanên cuda cuda de. (Kemal Beşer, 2000 : 631).

1.2.1. Pênasayên Tîpê

Tîp: Wêneyê dengî ye, di nivîsînê de tê dîyarkirin û bi dîtnê tê wergirtin. (Ewrehmanê Hacî Marîf, 1986 : 82).

Tîp: Hêmayê nivîskîye bo dengê zimanê, herwesan derbirîneke amajê (delalet)ê dikete ser dengê zimanî, bo mînak tîpa (R) ji bo dengê /re/ ûn tîpa (M) ji bo dengê /me/ û her hemî bi vî awayî. (Ebdullezîz Elsîyex, 2007 : 217).

Tîp: Wêneyê rast û drustê dengane ku birge û peyv û hevok jê tên drust kirin. (Peyman Musa Sadî Bîrî, 2016 : 12).

Tîp: Wênê dengî ye, bi nîşan di nivîsînê de hatîye dîyarkirin û bi sedemê bîninê tê wergirtin. (Nerîman Ebdulla Xoşnaw, 2013 : 13).

Ev pênaseye wê yekê digehînin ku zimanvan her hemî hev boçûnin, yan boçûnên wan nêzîk hevin sebare bi pênsekirina tîpê, ku ew jî tîp wêneyê nivîskî yê dengên zimanîye ku peyv û hevok jê drust dibin.

Tîp: Di zimanvanîyê de hêmaya nivîsînê ye, taybetmendîya tîpan ewe kû guzarîştê ji dengên axiftinê diken. (Le Petit Robert, 1993 : 733).

Anku em dikarîn bibêjîn hemî deman deng û tîp cihê hev du nagirin her çende tîp wêneyê dengîye, lê cudahîyek di navbera wan de heye, ji ber ku bara pirtir tîp ji dengî mezintir e, anku di şêyandaye tîpek ji çend dangan pêk bê, bo mînak weke tîpa (M) ji dengên (/M/ û /E/) anku ji (ME) pêk tê, û dîsan tîpa (C) ji dengên (/C/ û /E/) anku ji (CE) pêk tê. Bi taybetî demê ev tîpe bi rêzband weke elîfbayê tên xwendin.

1.3. Fonîm

Fonîm yekeyeka nebercisteye bi tenê dinava mêşkê mirovî de heye, tîp alaveke bo nîşandan û dîyarbûna fonîmê, ji ber vê yekê gelek zimanvan cudahîyê di navbera fonîm û tîpê de naken û bi du zaravên yeksan di bînîn.

1.3.1. Têgehê Fonîmê

Têgehê fonîmê (The Fonîm) hatîye danan di rastîya bikaranîna wê liser dengî bi wateyê xweser (Mutleq), û bi borîn û derbazbûna demî û pêşveçûna bîra dengî, bikarîna fonîmê hate kurtkrin ji bo amajekirina dengên dest nîşankirî ji aliyê bihay û erkên we di nava zimanê dîyarkirî. (Kemal Beşer, 2000 : 19-20).

1.3.2. Pênaseyên Fonîmê

Da ku em baştir ji fonîmê fam bikeyn ya pêdvîye fonîmê bibaşi bidîn nîyasîn, zimanvanan bi gelek awayan fonîm pênasekirîye, dê hewil deyn hinek ji wan pênaseyan ber çav keyn.

Maryo Pay (1998 : 88) dibêje: Fonîm ew zanîste yê çareserîya saxletên dengî yê girêdayê bi zimanekê dîyarkirî diket li gor hest û sîzên axiftinkerên zimanî. Li gor vê pênaseyê fonîm zanîsteke ku kilîla çareserîya kêşeyên zimanekê dîyar kirîye, anku xwe li arîşeyên dangan diket xwedî.

Fonîm: Ew daneya dengîye ku şêyanên ji hev cudakirin û guherîna wateya peyvê hebît, anku dibêjne wan dangan fonîm ku di zimanî de peyvê pêk tînin û bi guherîn û ladana wan wate tê guherîn. (Ewrehmanê Hacî Marif, 1976 : 16). Bo mînak eger fonîma [Z] di peyva (Naz) de biguherîn bo fonîma [N] wesa peyva (Nan) drust dibe, ku cudahiyeke gelek temem di wateya ewan de heye.

Fonîm: Ji rûyê zanistê zimanvanîyê ve navekê nêre, pêk tê ji deng zimanî, bi hinek xasîyetên xweya tê cudakirin kû berûvajî dengên din ên di zimanî de ne. (Le Petîr Larrousse, 2009 : 770).

Fonîm: Komeke dengên cudaye ku li nava sîstemê zimanekî de yek biha xweya diken, ev hemî denge di wî zimanî de yek fonîm pîktînin, bo her fonîmekê ji bo merama nivîsînê nîşaneyekê bo danin û bi tîp li qelem diden, wate tîp dengî dernabirît lê fonîm derdibirît, fonîm jî dibe ku komeke dengên derbibirît, eve jî wê yekê digehîne ku fonîm tiştêkê serbixwe ye (Mucered)e. (Wirya Omer Emîn, 1984 : 36). Ev pênasîye bi aweyeke berçav cudahiya di navera fonîm û dengî de dide xweyakirin.

Fonîm: Pişkeke ji pêkhateya peyvê û cudahiya fonîmekê li du peyvên wek hev bandorê dikete ser cudahiya wateya peyvan. (Bazyar Yonis Mihêddîn, 2013 : 5).

Fonîm: Yekîneyeke dengî a biçuke bandorê dike ser wateya peyvan bi awayekî ku biguherîn bo fonîmeke din, dibe sedemê guherîna wateyê, anku dibe sedemê cudahiyeke dinavbera peyvan ji aliyê wateyê ve. (Mehmod Ekaş, 2005 : 30).

Fonîm: Fonîmê bi serê xwe çî biha nin e, anku ger ya ser bixwe bît wate nîne, lê di sinorê peyvê û morfîmê de wateyê drust diket. (Ebdullqadir Ebdullcelîl, 2006 : 203).

Fonîm: Biçuktirîn daneya zimanî ye a ku peyvek ji peyveke din tê cudakirin, bi mercekî ku mirov bi hebona wê haydar bît, bo mînak (DER , BER , SER) bi dengên /D/ û /B/ û /S/ cudane û ew cudahiye wateyê diguhere, lew ev her sê denge fonîmin. (Fazil Omer, 2004 : 29). Palmer behsa wateyê û fonîmê diket û dibêji ku wate û fonîm pêkve digirêdayî ne, ba awayekî ku ji hev cuda nabin. (Bazyar Yonis Mihêddîn, 2013 : 87). Anku wate dibe xala cudaker di navbera dengên zimanî û fonîmê de.

1.4. Fonîm û Elofon

Fonîm û elofon du zaravin ku gelek tîen bikarînan di nava zanistê dengî de, berî niha me pênasayên Fonîmê dane xweya kirîn, li vir de dê hewil deyn cudahîya di navbera fonîm û elofonê de berçav keyn.

Fonîm pêktên ji dengên cuda yê zimanekî, herwesa li gor tîyorên fonolojîyê fonîm pêktêt ji biçuktirîn dane(yeke) di sîstemê dengî yê zimanekî de, lê elofon xwendîna cuda a fonetîkî ye, ew xwendine çî guherîne di wateya peyvê da drust naket. (Selam Nawxoş, 2005 : 40). Bi vî awayî em dikarî bibêjî fonîm wateyê diguherît lê elofon wateyê naguherît.

Elofon wate awayê cuda yê dengî cudayê dengî, pêkhatîye ji (Elo + fon), (Elo bi wateya (awayê cuda) têt, û (fon) jî bi wateya (deng) têt). (Bazyan Yonis Mihêddîn, 2013 : 87). Anku elofon awayê cuda yê dengîye.

Elofon jî beşeke ji fonîmê, dengên wek hevin digel dengên din ku ji fonîm û elofona bixwe digel hev dabeş dibin ji aliyê werarê ve yan digel hev tîen guherîn, guherînek azad. (Şebil Ode Ebdullah, 2010 : 25).

Fonîm her wek yekeyên din ên zimanî, zimanvanan bi çend awayekên cuda pênasikirî ye, ku me berî niha çend pênasayêk ji wan berçav kirin, zorîneya zimanvanan li ser hindê rêkeftîne ku fonîm yekeyeka zimanî ye bi rêya alogorkirina wê li cihê dengê din di heman jîngeh da dibe sedemê guherîna wateyê. (Ebdullselam Necimeddîn Ebdulla û Şêrzad Sebrî Elî, 2011 : 71). Her weke di van minakên jêrîda xweya dibe.


Har

Dar

Bar

Mar

Ew peyvên li serî di hemî dangan de wek hevin bi tenê dengê nebît, û ew cudahîya dengî bûye sedemê guherîna wateya wan. Lê eger ew dengê cuda wate neguherî li wî demî ew deng dê bibe elofon, weke evî hêlkarîya li jêrîda. (Ebdullselam Necimeddîn Ebdulla û Şêrzad Sebrî Elî, 2011 : 72).




hêlkarîya 2 fonîm û elofon

Di evî hêlkarîya serî de, dengên /S/ û /ʃ/ û di peyvên (Sed û Şed) de wate neguhertî ye, ji ber hindê ew her du dengê dibin elofonên fonîma [S].

Peywendî ya di navbera fonîm û deng û elofonê li ser heremeka sê goşeyî de hatîye damezrandin, ji ber ku heta dengê drust nebe û ne keve biwarê derbirînê, fonîmê drust nabe, bi wateyêke din dengê di zimanê de giştgîre û di zimanekê dîyarkirî de bi fonîmê û bi taybetî werdigirîn. Derbareyê elofonê jî di navbera herdukan de weke darekê ta(liq) û belgên xwe di hemî layekî de belav diket. (Mihemmeh Emîn Hewramî, 1973 : 64). Fonîm tişteke (مجرد) (Abstract) e nunerîya çend dengên cuda diket di zimanekê taybet de. Ev dengê jî awayên cuda bi xwe ve digrin li gor jîngeha cuda ya ew têde derdikevin. (Wirya Omer Emîn, 1984: 36).

Peywendîya di navbera fonîm û deng û elofonê dê di evî hêlkarîya jêrî de berçav keyn:



hêlkarîya 3 Peywendîya di navbera fonîm û deng û elofonê . (Bazyan Yonis Mihêddîn, 2013:82)

Wate fonîma [S] di zimanê Kurdî de du deng hene, ku dengên /S/ û /Ş/ weke di peyva (Sar û Şar) de derdikeve di her du peyvan de deng /S/ û /Ş/ bi fonîma [S] derdikeve, lê belê di derdirînê de du dengên ji hev cuda peyda dibin ku pêk tên ji /S/ (Sar) û /Ş/ (Şar), her du deng jî dibin elofoa fonîma [S] di jîngeheke cuda de ew du şêwe dengên bi fonîmê bexşî, eger ne, her du deng jî her yek fonîme, ji ber ku hîç cot peyvek di zimanê Kurdî de nahên dîtin ku ji heman rêzên dengî pêk hatibin, tenê ji egerê /S/ û /Ş/ beramber yek û du wateya peyvê biguherin wek bibêjîn (Sal , Şal) her du yek wateyê diden ji ber vê yekê yek fonîmin û nabin du fonîmên cuda.

1.5. Dengên Zimanê Kurdî

Di vî babetî de cudahî di bîr û bocûnên nivîser û vekolerên Kurd de heye, Bavê Nazê di pirtûka xwe de (Rêzmana Kurdî) û Fazil Omer di pirtûka (Çend Awirek li Zimanê Kurdî) de. Li gor elîfbaya Mîr Celadet Bediexanî ev tîpên li xwarê bû zimanê Kurdî dest nîşan kirîne, jumareya wan (31) tîpin.

(A a , B b , C c , Ç ç , D d , E e , Ê ê , F f , G g , H h , I i , Î î , J j , K k , L l , M m , N n , O o , P p , Q q , R r , S s , Ş ş , T t , U u , Ê ê , V v , W w , X x , Y y , Z z).

Hejî amajê ye ku hinek nivîser (R' r') lê zêde diken û hinekên din (Ĥ ĥ , Ľ Ľ , Ğ ğ) lê zêde diken.

Her dîsan Arif Zêrevan weha behsa wan cure dengan diket, dibêje ew denge ne Kurdî ne lê beşek ji Kurdan bikartîne, her ji ber vê yekê ew ne xistne di nava tîpên Kurdî de, ew jî eve ne:

Ğ ğ , Ğar Ĥ ĥ , Ĥal. (Arif Zêrevan, 1998 : 12).

Vekolînên dengan kiryareke zanistî û hûre, dengên zimanî tên polîkirin bo du gropan, ku dengên (dengdar û dengdêr)in, her gropek ji evane hinek dengan bi xwe ve digrît ku xwedî saxlet û taybetmendiyên hev beşin. (Kemal beşer, 2000 : 29).

1.5.1. Cûreyên Dengên Zimanê Kurdî

1.5.1.1. Dengên Dengdar (Nebizwên) (CONSONANTS)

Dengên dengdar di her zimanekê cîhanê de hene, lê jumareya wan di zimanekî bo zimanekê din cudaye, di zimanê Îngilîzî de (21) dengdar hene û zimanê Erebî de (26) dengdar hene û di zimanê Farsî de (23) dengdar hene. (Ebdullselam Necimeddîn Ebdulla û Şêrzad Sebrî Elî, 2018 : 81). Û di zimanê Kurdî de (23) dengdarin.

1.5.1.2. Pênaseyên Dengdaran

Dê hewil deyn nêrîna hinek zimanvanan li dor pênaseyên dengên dengdar bideyn xweya kirin.

Abercrombie. D. (1987 : 39) bi vî awayî dengên dengdar dide naskirin: Dengdar dengin li demê bilêvkirina wan rêrewê bay vekirî nîne, anku ew bayê ji sîhan tê paldan, bi rêka endamên bilêvkirinê tê rawestandî yan ew endam dibin rêgir di rêya derkeftina ewî bay de.

Firank Nufo (2012 : 231) dibêje: Dengdar cûreyeke ji dengan, wesa tê naskirin, ku rêka bay di kenlê devî de li cîyekî yan li çend cîyan bi tamamî yan bi awayeke beşî tê girtin.

Ew denge ku di xwedî dinge, lê dengê wê bi sere xwe û bê alîkarya dengdêran dernakeve, ku jumareya wan (23) tîpin, ew jî eve ne:

(B b , C c , Ç ç , D d , F f , G g , H h , J j , K k , L l , M m , N n , P p , Q q , R r , S s , Ş ş , T t , V v , W w , X x , Y y , Z z). (Arif Zêrevan, 1998 : 11).

1.5.2. Dengên Dengdêr (Bizwên) (VOWEL)

Weke dengên dengdar dengên dengdêr jî di her zimanekî ji zimanên cîhanê hene, lê jumreya wan ji zimanekî bo zimanêke din cudaye, di zimanê Îngilîzî û Îspanî û Japonî de (5) dengdêr hene û zimanê Erebi de (3) dengdêr hene û di zimanê Farsî de (6) dengdêr hene û di zimanê Kurdî de (8) dengdêrin. (Ebdullselam Necimeddîn Ebdulla û Şêrzad Sebrî Elî, 2018 : 75).

1.5.2.1. Pênaseyên Dengdêran

Dê hewil deyn nêrîna hinek zimanvanan li dor pênaseyên dengên dengdêr bideyn xweya kirin.

Ew denge ku di xwedî dinge, û bi sere xwe derdikeve û dengê dengdaran derdixîne, û jumreya wan di zimanê Kurdî de (8) dengin, ew jî eve ne:

(A a , E e , Ê ê , I i , Î î , O o , U u , Û û). (Arif Zêrevan, 1998 : 11).

Abercrombie. D. (1987: 38-39) bi vî awayî dengdêran pênase diket: Dengdêr ew dengin li demê bilêvkirina wan çi girtin yan berteneg bun nakeve di rêya rêrewê axifînê de û eve rêkê dide bay bi sanahî ji devî derbaz bibît.

Firank Nufo (2012 : 231) bi vî awayî dengdêran pênase diket: Dengdêr cureyeke ji dangan, weha tê naskirin, ku ba di kenalê devî de bê girift û asteng derbaz dibe, ku bilêvkirina wan de perdeyên dingî dilerizin.

Dengên dengdêr jî dabeşî du cureyan dibin:

Dengdêrên kurt: (E e , I i , U u).

Dengdêrên dirêj: (A a , Ê ê , Î î , O o , Û û). (Bavê Nazê, 2012, 19).

Herwisan Arif Zêrevan (1998 : 24) derbarey kurt û drêjya tîpan dibêje, dengdêrên kurt tu caran dirêj nabin û ên dirêg jî tu caran kurt nabin.

(Çîmson) dibêje ji bo wesfkirina her dengekê dengdêr pêdvîye têbînîya evan xalên li xarê bikeyn:

- 1- Cihê pehinka nerm, ku bo dengdêrên devî ya li serî ye û bo dengdêrên difnê li binî ye. Pêdvîye li vir de amajeyê bi wê yekê bideyn, ku di zimanê Kurdî de dengdêrên difnê nînin belku tenê dengdêrên devî hene, merem ji dengdêrên devî, ew dengdêrin ewên li demê bilêvkirina wan ba(hewa) ji devî derdikeve berûvajî dengdêrên difnê ku ew dengdêrin ewên li demê bilêvkirina wan ba(hewa) ji difnê derdikeve.
- 2- Cureyê valahîya drustkirî ji alîyê lêvan ve, anku pileya girovirî yê û firehî yê.
- 3- Parçeya ezmanî, pileya bilind ya zemanî. (Ebdullselam Necimeddîn Ebdulla û Şêrzad Sebrî Elî, 2018 : 75).

Ji evê çendê xweya dibe ku li demê wesif kirina dengên dengdêr tê kirin, ya girînge binêrîne awayê lêvan û cihê ezmanî û pehinka nerim.

1.5.3. Dengên Nîmçe Dengdêr (SEMI VOWEL)

Berî em pênaseyên dengên nîmçe dengdêr (SEMI VOWEL) bikeyn, ya pêdvîye ewê çendê bizanîn, ku hinek zimanvan zaravê nîmçe dengdar (SEMI CONSONANT) ji bo heman meremê bikar tînin. . (Ebdullselam Necimeddîn Ebdulla û Şêrzad Sebrî Elî, 2018 : 85). Anku (SEMI VOWEL) û (SEMI CONSONANT) her du yekin.

Sebaret bi pênaseya nîmçe dengdêrî Firank Nufo (2012 : 479) dibêje: Nîmçe dengdêr ew denge ewê dikeve li cihekê navendî dinavbera bilêvkirina dengên dengdar û dengên dengdêr de.

Herwesa (Mecem ELMustelhat ELerebîye) bi vî awayî pênaseya nîmçe dengdêr diket: Dengê (SEMI VOWEL) ew denge ewê erkê (CONSONANT)ê hey, belê ev denge ji sîmayên dengê (CONSONANT)an di valane, weke hebûna girtinê û vêkkeftinê. (Remzî Munîr Belebegî, 1990 : 447).

Anku dengên nîmçe dengdêr hemî saxletên dengdêran têdane û di bê barin ji saxletên dengdaran, lê lidemê pêtvî dibin dengdar.

Li vêrê dixwazim bibêjim ku di rênivîsa Kurdî a latînî amaje tenê bi dengên dengdar û dengdêr daye, anku dengên (SEMI VOWEL) hebûna xwe nîne di rênivîsa navbirî de, eve jî li gor elîfbaya Kurdî a Celadet Alî Bedîrxan ku ji berhev kirina Arif Zêrevan e. Lê di rênivîsa Kurdî a Erebi de dengên nîmçe dengdêr hene, ku ew ji

eve ne (/U/ dibe /W/ û /Î/ dibe /Y/). (Ebdullselam Necimeddîn Ebdulla û Şêzad Sebrî Elî, 2018 : 85).

Em zêdetir behsa nême dengdêran nakeyn ji ber ku vekolîna me bi tîpên latînî ye, weke me amaje pêday di rênivîsa latînî de nême bizwên nînin.

Cudahîya di navbera dengdar û dengdêran de bi vî awayî dê ber çav keyn:

- 1- Jumara dengdaran zêdetire ji jumara dengdêran.
- 2- Dengdaran dirkinera çalak û cihê derbirînê yê dîyarkirî heye, lê dengdêran cihê derbirînê(sazgeh) dîyarî kirî nîne.
- 3- Dengdar yan ya rawestayî yan xişoke, yan layî ye yan dubare kirîye, yan çemandî yan difnî ye, belê dengdêran ev sîfete nînin.
- 4- Dengdar yan gire yan kipe, belê dengdêr herdem gire. (Talîb Husên Elî, 2015 : 49).

1.6. Dengên Kip û Dengên Gir

Dengên zimanî ji bilî ku dabeş dibin li ser dengdar û dengdêr û nême dengdêran, her wesa ev her sê denge dabeş dibin li ser kip û giran, ku li xwarê dê bizavê keyn behsa dengên kip û gir keyn.

- 1- Dengên Kip (VOICELESS): Firank Nufo (2012 : 401) Sebraret bi pênaseya dengên kip dibêje: Dengên kip ew dengin ewên ku li demê bilêvkirina wan perdeyên dengî nelerzin.

Di zmanê Kurdî de dengên kip even e: (P , T , X , Ç , S , Ş , F , Q , K , H). (Ebdullselam Necimeddîn Ebdulla û Şêzad Sebrî Elî, 2018 : 88).

- 2- Dengên Gir (VOICED): Di (Mecem ELmustelhat ELerebîye) hatîye ku (girî - VOICED), sîmayekê dengîye ku li demê bilêvkirina wan perdeyên dengî dilerzin. (Remzî Munîr Belebegî, 1990 : 531).

Di zmanê Kurdî de dengên gir pêktên ji hemî dengên dengdêr û van dengên dengdar (B , D , C , R , Z , J , V , M , N , L , G , W , Y). (Ebdullselam Necimeddîn Ebdulla û Şêzad Sebrî Elî, 2018 : 88).

1.7. Pulîn Kirina Dengdaran

Dengên dengdar li gor çend binemayekên dîyarkirî dihêne pulîn kirin ku ew jî evê ne:

A- Cihê peyda bûna dengan:

- 1- Dengên lêvî: (B , P , W).
- 2- Dengên lêvî didanî: (V , F).
- 3- Dengên pidwêkîya pişt didanî: (T , D), bi alîkarîya serê ezmanî peyda dibin: (S , Z).
- 4- Dengên pankaya devî: (K , G , R , J , Ş) ku bi alîkarîya ezmanî peyda dibin.
- 5- Dengên ezmanî: (C , Ç) li serê pankaya devî peyda dibin.
- 6- Dengên difinkî: (N , M) û hinek jî hev cuda diken bo pidwêkî, lêvî.
- 7- Dengên gilalîşkî (GLOTTAL)_ hefkî: (Q , X).
- 8- Dengên rexkî (LATERAL): (L), ku jî rexê ezmanî peyda dibe dema ezman bi pidwê ve.
- 9- Dengên qirkî: (H). (Fazil Omer, 2004 : 32).

B- Awayê derkeftinê û bilêvkirinê yan derbirîna dengdaran:

- 1- Dengên pengîyayî yan peqînekî: Ew dengên ewên jî pengîyana bay û jî nîşkekê ve jî berdana bay peyda dibin, ev dengê jî dibine devî yê bêvlî (STOPS) yan (PLOSIV), weke (B , P , D , T , G , K , Q).
- 2- Dengên pêvexişanê (FRICATIVE): Derkeftina van dengên bi awayeke pêvexişanê diqewme, hinek liser lêv û didanan dixişin, hinek li ser pidwê, hinek li ser pankaya devî, weke: (V , F , Z , J , S , Ş , X , H).
- 3- Dengên bê xişan (AFFRICATIN): weke, (C , Ç).
- 4- Dengên bê xişan_ berdewam yan dibêjnî nîmçe bizwên (SEMI VOWEL): weke, (W , Y).
- 5- Dengên rexkî: weke, (L).
- 6- Dengên lerzûk: (R). (Fazil Omer, 2004 : 32-33).
- 7- Dengên difnê (NASAL): weke, (M , N). (Ebdullwahîd Muşîr Dizeyî û yê din, 2013 : 47).

	Lêvkî	Lêv_didanî	pidwîkî	Pidwî_ panka devî	Gilalîşk	Hefik	Qirgî
Peqînekî	B , P		D , T		G , K	Q	
Pêvexîşan		F , V	Z , S	J , Ş		X	H
Bê xîşan				C , Ç			
Bêxîşyan_ berdewam	W			Y			
Rexkî			L				
Lerzûk			R				
Bêvlî_difnî	M		N				

Xiştê 1 dabeşkirina dengdaran. (Fazil Omer, 2004 : 47)

1.8. Pulîn Kirina Dengdêran

Herwisan dengên dengdêr jî li gor du binemayên sereke dihêne pulîn kirin ku ew jî eve ne:

A- Ew beşê ezmanî yê ku pişikdarîyê di bilêvkirina dengên de diket, ku ew jî dibin sê cure:

- 1- Dengdêrên pêşve: Anku ew dengên ewên di beşa dest pêka ezmanî drust dibin, ew jî (Ê , Û)e.
- 2- Dengdêrên naverastê: Anku ew dengên ewên di beşa naverasta ezmanî drust dibin, ew jî (A , E , U , I)e.
- 3- Dengdêrên dawîyê: Anku ew dengên ewên di beşa dawîya ezmanî drust dibin, ew jî (O , Ô)e.

B- Dengdêr li gor bilindî û nizimîya ezmanî li demê bilêvkirinê ku ew jî eve ne:

- 1- Dengdêrên girtî (bilind): Ew dengên yên ku li demê bilêvkirina wan ezmanî yê di awayê bilind bûnê de, ew jê eve ne, (Û , U , I , Î).
- 2- Dengdêrên nîv girtî (nîv bilind): Li demê bilêvkirina wan dengên ezmanî pîçek nizimîyê ji yê berê, ew jê eve ne, (O , Ê).

- 3- Dengdêrên nîv vekirî (nîv nizm): Li demê bilêvkirina vî dengî ezman pîçek tê xwarê û valahîya devî pitir lê tê, ew jî dengê (E)e.
- 4- Dengdêrên vekirî (nizm): Li demê bilêvkirina vî dengî ezman zêdetir ji ya berê tê xwarê û valahîya devî mezin dibe û vakirî dimîne, ew jî dengê (A)e. (Ebdullwahîd Muşîr Dizeyî û yê din, 2013 : 69-70).

Rêz			A Î Ê O	
Dawîya ezimanî	Naverasta ezimanî	Pêşîya ezimanî	Û U I E	
Û	U I	Î	Girtî	Radeye bilindî û nizmîyê
O		Ê	Nîv girtî	
	E		Vekirî	
A			Nîv vekirî	

Xiştê 2 dabeşkirina dengdêran. (Selwa Ferîq Salih, 2017, 12).

1.9. Deng û Guherîn

Arasteyê xwezayî yê zimanî û bi taybetî di wêneyê wî yê darêjtî yan yê timam de, ew arasteyê ku ji naverastê der dikeve, merem jî naverasta zimanî ye, ji ber ku zimanî arezûya guherînê heye çî di nava demekî de yan di cihê de, bi awayekî ku ev arasteye nahê rawestandî û çî eger nabin ku bi zivîrte naverastê, ev taybetmenîye ya cîhanî ye ji bo zimanî û ya girînge bo zimanvanên dîrokî, ji ber ku binyatê guherînê di zimanî de pêk tînît. (Maryo Pay, 1998 : 71).

1.9.1. Çemkê Guherînê Di Zimanê De

Ger em bihên pênaseya guherînê berçav bikeyn ji aliyê zimanî û çemkî, guherîn ji aliyê zimanî ve guherîna tiştêkî bi tiştêkî din yan cihê du tiştan lêk biguherîn, lê guherîn weke çemk: Danana tîpekê li cihê tîpeke din, ku di nêzîk hev bin ji aliyê dengî ve, û hemî tîpên din yê peyvê weke xwe bimînin. (Wehîd Sefye, 2009 : 4). Ji evan her du pênaseyan me cudahîyeke weha nedît di navbera zimanî û çemkî de.

Herwesa guherîna dengan di zimanê Erebi de piranîya dengan bi xweve digirît, her weke Ebo Hesên ELzayî gotî: Hindî dengê tîpekê dihêt dê bînî guherîn a têde, kê m nebin. (Wehîd Sefye, 2009 : 40). Li vir de weha xweya dibe ku guherîna dengan tişteke xwezayî û normal e.

Herdem ziman yê liber egerê guherînê, her çende axiftinkerê hîç zimanekî jî haydarî evê guherînê nîne ewa ruidet, bo mînak Îngilîzî a Emrîkî guherîneke weha ya di rêde ku cudahîyê naken di navbera (Cot) û (Caught) de, ku ya yekê bi wateya (cih yan nivîn) tê, û a duyê bi wateya (girtî) tê. Ê piştî bûrîna serdemeke din bandora van guherînan wê zor zêdetir be, dibe ku xwendevanên vê serdemî pêtvî bi çendeha têbînî û ronkirina bît ji bo ku bikarin bi drustî dinivîsînên (Wilyem Şikspîr)ê şanû nivîs têbigihin, ku li dawîyên çerxê şazdê û destpêka çerxê hevde nivîsîne, herwisên Îngilîzî a helbestvanê çerxê çardê (Cêfrî Çawser) zor a cudaye ji zimanê nû ê niha, dibe kû xwendevanên weha pê baş be ku bîn wergerandin bo Îngilîzî a nû. (Bêrnard Kemrî û yê din, 2007 : 46).

Guherîn hêzeke kar diket ji bo paldana zimanî ber bipêşveçûnê di gişt sekerên cuda de, ji ber ew milmilana dinavbera zimanan de hey, ger ziman xwe parast û hate girêdan bi kevnariya xwe ve dê bestît û paşve çît, lê ger singê xwe berfire kir ji bo pêşveçûnê û yasayên xwe parastin da kesayetiya xwe ji dest nedet, li vir de guherîn nayêt bi wateya xirabkirinê û gendeliya zimanî lê belê têt ji bo pîrkirina pêtvîyatîyên mirovan di civakî de, guherînên zimanî ne, nek yê rewîştî. (Mubarek Xemqanî, 2016 : 167).

1.9.2. Taybetmendîyên Guherîna Dengan

Guherîna dengan çend taybetmendîyek hene ji wan jî:

1- Guherîneke gelek hêdî hêdî û pêngav pêngav bi rêve diçe:

Guherîna dengan di şevê û rojê de rû nadet, demekê dirêj divêt, û bandora vê guherînê pişte gelek nîşan der dikeve holê, ev guherîne jî gişt alîyan bi xweve nagrît, tenê hinek alîyan bi xwe ve digirît. (Remezân Ebdulltewab, 1997 : 21). Ji bo evê meremê Elî Ebdullwahid ELwafî (2004 : 285) dibêje: Zimanê me gelekê cuda nîne di gel zimanê bavên me lê gelekê cudaye di gel zimanê bavkalkên me.

2- Guherîneke otomatîke:

Guherîneke şêyanên mirovî destkarîyê tê de naken. (Ferîde Cewadu, 2014 : 13). Anku ev guherîne bi awayeke serbixwe û otomatîk rû diden, û hestên mirovan û vîyana axiftikeran nikarin dest werdanê di vê guherînê de biken. (Fewzî Hesên Elşayib, 2004 : 34).

3- Guherîneke ya girêday demî û cihîye:

Guherîna dengan ya girêday demî û cihîye, piranîya bûyerên guherîna dengan û bandora wan li ser jîngeheke dîyarî kirî û demeke dîyarî kirî xweya dibe, û ev dîyardeye gişt zimanên cîhanê bi xwe ve digirît. (Mubarek Xemqanî, 2016 : 169).

4- Guherîna dengan guherîneke derkirinê ye:

Anku eger dengê hate guherîn ew deng dinava zimanî de namîne û di gişt peyvan de ewên wî dengî bi xwe ve digirin, û li dev gişt axiftinkerên wê deverê ya ku ew devokê bi xwe ve digire. (Elî Ebdullwahid Elwafî, 2004 : 287).

5- Derbirîneke civakî ye:

Anku derbirîneke takekesî nîne, û takekes nikarît bi serê xwe vê guherînê biket, ji ber ku me got demekê dirêj pê divêt, anku guherîneke civakî ye ji egerê çavlêkirinê belav dibe. (Ferîde Cewadu, 2014 : 14).

1.9.3. Guherîn Di Asat Dengî De

Aşkeraye ku ziman li ser binemaya bilêvkirinê hatîye damezrandin, û di rastî de bilêvkirina dengên zimanî jî weke xwe namînin, lê belê bibûrîna demî guherîn bi ser de têt, hinek caran ev guherîne ya ser xwe ye û hinek caran jî zû rû dide. Herwesa vî astê zimanî ankû asta dengî pirtir ji astên din tê guherîn pirtir hest pê tê kirinê. (Talîb Husên Elî, 2015 : 101-102). Di gel evê jî de weke bûyeryeke gelemperî gişt zimanan bi xwe ve digirît, bi taybetî dema kû diçin biwarê axiftinê bilêvkirina raste rast de, ji ber ku ji hev cudakirina dangan ji wêneyê wê(nivîsîna dengî) vê rastîyê bo me xweya diket, ku her dem pirtir guherîn bi ser dengî de tê ji nivîsîna wî, û baştirîn belge bo vê yekê, zor caran dê binîn nivîsîna hinek zimanan cudahî ya hey di gel bilêvkirinê, wate guherîn her dem ya berdewame di bilêvkirinê de, lê belê awayê nivêsinê her weke xwe ye may û ne guherîye. (Ehmed Muxtar, 1976 : 317).

1.9.4. Beşên Guherîna Dengan

Du beşên guherîna dengan hene ew jî (guherînên dîrokî û guherînên pêkhatinê)ne.

1.9.4.1. Guherînên Dîrokî

Ev cureyê guherînê di navxweya dengî de çêdibe, bibûrîna demeke dirêj bi ser dengî de, anku dengê bi gişt sîfet û bilêvkirina xwe tê guherîn bo dengeke din. (Selaheddîn Seîd Husên, 2009 : 19). Anku borîna demî û dîrokeke dirêj dibe egerê wê yekê ku hinek caran dengê bi gişt hebuna xwe ve bihête guherîn û li cihê wê dengeke din bê danan, bê ku guherîn di wateyê de rubidet, kurtir bibêjîn li serdemekê kevin de dengê dihat bikaranîn di evî serdemî de dengeke din li cihê wî dengî tê bikar anîn. Bu mînak:

<u>Pehlewî</u>	<u>Farsî</u>	<u>Kurdî</u>
Demîk	Zemîn	Zevî
Dimistan	Zmistan	Zivistan
Şimore	Simore	Sivore (Fazil Omer, 2004 : 59).

Ev mînakên li serî di navber du zimanan de bûn, ger em bînin di yek ziman de wergirîn bo minak, di Kirmançî de serdemekî de peyva (Nimêj) bikar dihat, lê serdemê niha dengê /M/ hatîye guherîn bo dengê /V/ û peyv bûye (Nivêj). Herwisan di zimanê Erebi de serdemekî de peyva (Zeheb) bikar di hat û di serdemekî de peyva (Deheb) bikar di hat û de zimanê niha de (Deheb) bi kar tê. (Selaheddîn Seîd Husên, 2009 : 19).

Bo minak di zimanê Kurdî de Kirmançîya jorî hinek guherîn li gor borîna demî û dîrokê li ser dengan de hafîne weke di evan xwarê de dîyar:

1- Dengê /V/ di hinek peyvên boye /B/ weke:

Bav ____ **Bab**
Vefir ____ **Befir**

2- Piştî hatina îslamê li hinek deveran dengê /B/ li niv û paşîya peyvên boye /V/ weke:

Sibe ____ **Sive**
Bibir ____ **Bivir**

Tebayî ____ Tevayî

3- Dengê /M/ di hinek peyvên de boye (/V/ û /W/) nexasme li niv û paşîya peyvên, weke:

Nimêj ____ Nivêj ____ Nuwêj. (Fazil Omer, 2004 : 58-60-63).

1.9.4.2. Guherînen Pêkhatayî

Ew guherînin ewên di pêkhataya peyvê de rûdiden, weke guherîna hinek dengan û ladana wan yan cihguherîna wan. (Remezani Ebdulltewab, 1997, 29). Ev xale dakûkîyê dikete ser ew dengên amade di peyvê de ji ber ku gelek caran dengên cîran biryarê li ser guherîna diden, weke:

Bibir ____ Bivir (guherîn)

Berif ____ Befir (cih guherîn)

Hêlk ____ Hêk (ladan , jêbirin)

1.9.5. Sedemên Bandorê Di Guherîna Dengî de Diken

Guherîna dengan hinek taybetmendî hene ku dibin egerê guherînê ew jî eve ne:

- 1- Kartêkirina jîngeha cografî di guherîna dengî de: keş û hewa kartêkirneke mezin li ser dengên zimanî diket, sextî û hişkî û zivî ya xwezayî dê li ser axiftinkerên wî zimanî reng vedet, evca bi nermî yan zivîya xwezayî bît dê li ser axiftinkerî reng vedet. (Îbrahîm Enîs, 1971 : 164).
- 2- Barê derûnî û kartêkirina wê di guherîna dengan de: hinek zimanvan egerê rûdana guherînen dengî yê ku gelek ziman hingaftî, dizvrinin bo biwarê derûnî yê wî miletî, anku ew biwarê derûnî yê zal li ser miletî, anku ger biwarê derûnî yê miletî yê hevseng bît dengên wan ber bi nermîyê diçin, lê eger ew milete di derûneke neheqî û hişyarîyê de bijît zimanê wan wê dijwar be, ger ew di xemgînîyê û tengahîyê de bijîn bibe egerê bikaranîna pêkhatayên dengî dibe ku zor dijwar be. Ew belgeyên ku xwedîyên vê hizrê piştî xwe pê dibestin behsa guherîna dîrokî ya zimanê Elmanî diken, û ew encamên ku li ser pêşveçûna dengên miletê Elmanî bi xwe ve dîtî. (Îbrahîm Enîs, 1971 : 165).
- 3- Cudahîya andamên debirîna dengî ji nişkekî bo nişkeke din: Piranîya zanayan li ser vê kûkin kû endamên debirînê yê her miletê di cudan e, û kawdanên grêdayî bi her miletê di cudan e. Gewî(الاورار الصوتية), û ezman , û gişt andamên din yê

axiftinê cudane ji yên babkalkên me, ger di pêkhatê de wekhev bin lê di berhevbûnê de newek hevin, çunkî weke me amaje pê day ev guherîne zor hêdî hêdî û pêngav pêngave. (Ferîde Ciwadu, 2014 : 19).

- 4- Tîyûra hewldana bi hêz û bandora wê li ser dengî: Ew dengê ku xwedîyê hêz û mezinahîyê be pitir xwe radigirît û pitir berxwedanê diket û ew bandorê li ser dengên derdor diket, di bêjne evê (yasaya serkeftinê bi hêzê), ger fonîmek kefte bin bandorê bi evê rêkê yan rêkek din, ya lawaz bi hokmê cihê wê di birgê de yan bilind gotina ya din bandor dê dîyar bît. (Îbrahîm Enîs, 1971 : 162).
- 5- Tîyûra asanî û bandora wê li ser guherîna dengî: Ji xwezayê mirovane ku hredem çav li asanîyê bît di gişt bîyavên jîyanê de. Dê bînîn ku herdem çav li aborê ye di hewlên masulkên xwe de ji bo derbirînê, û dê wê helbijêrît ya bi sanahî ji bo gehandina zanyarîyan bi baştirîn awa(şêwe), dê rabît biguhertina dengên zehmet bi yên sanahî. (Ferîde Ciwadu, 2014, 19).

Ji alîyeke din hinek berhingarîya tîyûra asanî û bandora wê li ser guherîna dengî dikin, ku ewan jî belge û hicetên xwe hene ew jî eve ne:

- A- Ya bi zehmete em bizanîn ka kîş ya bi sanahîye û kîş ya bi zehmet.
- B- Sanahî û zehmet tişteke rêjeyî ye, dê bînîn mileteke destnîşankirî zor bi zehmet dengê derdibrin û mileteke din heman deng bi sanahî derdibrin, bo mînak dengên (/ح/ û /ع/) ji bo miletên Erebi bi sanahî ne lê heman deng jibû miletên weke Kurd û Faris bi zehmetin.
- C- Ger em xwe bi dest dengên sanahî ve berdeyn dê tev dengên zimanî bine (/M/ , /N/ , /F/), ji ber ku eve ji gişt dangan asantirin. (Ferîde Ciwadu, 2014 : 21-22).

Her dîsan Alî Abdullwahid Elwafî jêr nav û nîşanên (الاورار الصوتية) weha xweya diket ku guherîn û pêşveçûna dangan ji bo sê egeran dizivre:

- 1- Hevçûna dengên peyvê, anku du dengên ji hev nêzîk hene ji awayê derkeftinê, yek ji wan hinek caran ya din bixwe radikêşe.
- 2- Cihê dengî di peyvê de, cihê dengî li dawîya peyvê yan li nîva peyvê yan li destpêka peyvê dibe egerê gelek guherînan.
- 3- Cî girtin, pêkguherîn dangan û danana hinekan li cihên hinekên din. (Selaheddîn Seîd Husên, 2009 : 18).

1.10. Hokarên Guherîna Dengî

Hokarên guherîna dengî dibin du cur ku ew jî hokarên (nezimanî û zimanî)ne.

1.10.1. Hokarên Nezimanî

Hokarên nezimanî jî çend curin ew ji evene:

1.10.1.1. Desthilata Ramyarî û Serbazî

Ev hokare du cureye

A- Ramyarîya ji derve(derkî):

Di evî biwarî de civakê zimanî di keve jêr desthelata ramyarî ya raste rast yan ne raste rast ya civakê zimaneke din, di awayê raste rast de êrişkirina civakekî bo ser civakeke din, tê çaverêkirin ku peyvîn bîyanî bên dinava civakê dagîrkirî de. (Kiroş Sefewî, 1380/2001 : 121). Bu mînak li demê dabeşbûna Kurdistanê ji aliyê wilatên nawçey ve, di wî demî de gelek helbestvan û nivîserên Kurd keftine jêr bandora wan û gelek peyvên Farsî û Turkî di nava zimanê Kurdî de bikarînan, û bikarînan van peyvên di be sedemê guherînê û tê keftinê di nava zimanî de, herwesa di awayê neraste rast de jî bê ku êriş bête ser civakî, desthelata ramyarî ya civakekê bo ser civakeke din dibe sedemê wê yekê ku peyvên bîyanî bên dinava zimanê jêr dest de. (Ebdulla Ezîz Mihemmed, 1990 : 17). Mînak:

Esker _ Eskerî

Îstixbarat

Mifawizat

Zulim

Teeda

B- Ramyarîya navxwe:

Ramyarîya navxwe çî li srdemê kevin çî li serdemê niha de hîç mifayek negehndîye zimanê êkgirtî yê Kurdî , di srdemê kevin de her mîrgehekê ji aliyê xwe ve bizav dikir ku dîyalîkta xwe li ser dîyalîktên din bisepînît, û çî cara hizir di wê yekê de nekirîye zimanê êkgirtî yê Kurdî drust bikin. Herwesa di serdemê niha jî de pêngavên baş nehatine avêtin ji bo zimanekê êkgirtî, lêbelê her nawçeyek ji Kurdistanê rojname û govaran bi dîyalîkta xwe dertêxît û herwesan hebona çendîn

kenalên ragehandinê mina televizyûn û radyûyan. Ya ji hemîyê giringtir tenê giringî bi dîyîktên jorî û naverast tê dan, anku dîyîktên din hatine ji bîrkin, ku her yek ji ewan bizavê diket ku zaravê wan yên taybet bên bikaranîn ku taybetin bi wan ve weke (Qutabî _ Xwêndkar , Jin _ Afret). (Ebdulla Husên Resûl, 2002 : 8). Heresan şerê navxwe jî hokarekê din bo ku her devereke pitir giringîyê bi peyvên dîyalîkta xwe bidet. (Dîyar Ebdullkerîm seîd Halo, 2011 : 65).

Bo miak Ebdulla Peşêw di helbesteke xwe de dibêje:

Lem nîştîmane çarereşeda

Çîtan hêştuwe

Dabeşî neken wek rezî xotan?

Her be şehîdan serman bilind bû,

Ewanîştan kird be pezî xotan

Nawêrim qelemêk helgirim.

Nawêrim kirasêk le berkem.

Rûtan reş bê,

Xo renekanîştan beşkird !

Bilên "xwîndkar" ya "qutabî" ?

"Jin" ya "afret"

Rûtan reş bê,

Ta wişey naw ferhengekanîştan beş kird ! (Ebdulla Peşêw, 2014 : 142-143).

1.10.1.2. Hokarê Ayînî(Olî)

Wergitna ayînê dîyarîkirî ji alîyê civakekî ve dibe sedemê wê yekê ku çemk û peyvên ayînî weke xwe biçine di nava zimanê wî civakî de. Bo mînak dema ku civaka Kurdî ayîn(ol)ê îslamê wegitî komeka peyvên Erebî hatine dinava zimanê Kurdî de. (Ebdullselam Necimeddîn Ebdulla û Şêzad Sebrî Elî, 2011 : 290).

Hatina navên îslamî(Erebî) bo nava zimanê Kurdî :

Hesen , Elî , Muhammed , Ehmed , Ebdulla , Ebdullrehman.....Htd

Hatina çemkên ayînî bo nava zimanê Kurdî :

Ferz , Wacib , Zekat , Hec

Lê belê şêyan hinek destewajan wergêrîne ser zimanê Kurdî , eve jî vedgerît bo wê çendê ji ber ku ev peyve di ayînê Zerdeştî de hebôn û dihatin bikarînan, belê ew peyvên neşêyane wegêrin bo ser zimanê Kurdî vedigerît bo wê yekê ku di zimanê Zerdeştî de nebon û nedhatin bikaranîn. (Dîyar Ebdullkerîm seîd Halo, 2011 : 65).

Bo mînak:

Şelat __ Nivêj

Şewm __ Rojî

Cene __ Behest

Cehnem __ Duzex

1.10.1.3. Hokarê Derûnî

Merem pê ew hokare ewê ku dibin egerê karvedaneke derûnî li hember zimanê mileteke din yan zareke din yê zimanî bixwe. Bo mînak ew karvedana nerênî ya Kurdan li başûrê Kurdistanê hey li hember zimanê Erebi boye sedemê wê yekê kû peyvên Erebi ji zimanê xwe bihavêjin li hemberde peyvan ji zimanên din û bitaybetî ji zimanê Farsî werbigrin, bi taybetî ew dîyardeya niha li cem hinek roşinbîrên kurd peyda boye û bi sedan peyv ji zimanê Farsî hatine wergirtin û ev çende di navbera du zaran de jî rû didet. Bo minak:

Farsî Kurdî

Derbar Sera

Xurak Ahên xwarinê

Aşnayî Nîyasîn. (Ebdullselam Necimeddîn Ebdulla û Şêrzad Sebrî Elî, 2011 : 291).

Li vir weha xweya dibe ku biwarê derûnê yê miletî dibe egerê vê yekê, anku ger biwarê derûnê yê miletî erênî be beramber zimanekê din dê peyvan ji wî zimanê wergire yan dê peyvan wî zimanî wergêrît, lê ger biwarê nerênî be beramber zimanekê din axiftinker û roşenbêrên zimanî dê piştî xwe dene wî zimanî û dê bizavê ken ew peyvên hey jî jinava zimanê xwe derbêxin.

1.10.1.4. Hekarê Cografi

Hekarê cografi ji dibe du cure (sinûrê cografi û xwezayê cografi). Sinûrê cografi hebona sinûrê hevpişk dinavbera wilatan de û hatin û çona akincîyên deverên sinûrî û xizmayetî û aborê hevpişk û bide eger ku hinek têkelîya zimanî drust bibît, minak li Zaxo ku hev sinûre di gel Turkîya:

Afiyet olsûn

Xweş geldî

Sağ ol .(Ebdullselam Necimeddîn Ebdulla û Şêzad Sebrî Elî, 2011: 292).

Her ev dîyardeye bi awayeke berçav li devera qazaya Soran tê xweykirin. Lê sebareti bi devera Amêdîyê ta niha hîç sinûreke wesa kara(ektîv) nîne ku bandorê li ser zimanî bikit.

Serbert bi xwezayê cografi di guherîna dengî de, keş û hewa bandoreke mezin li ser dengên zimanî dikin, sextî û hişkî û zivri ya xwezayê dê li ser axiftinkerên wî zimanî reng vedet, evca bi nermî yan zivri ya xwezayê bît dê li ser axiftinkerî reng vedet. (Îbrahîm Enîs, 1971 : 164). Û her wesana hinek wesana hizir dikan ku ew mirovên li nawçeyên çiyayî dijîn zimanê wan yê bihêz û zivri, herçende dê bînî ku zimanê wan paqijtirê jî ji naçeyên deştayî, mirovîn çiyayî yê neçare bilindî û zivriyê bikarbînî di zimanê xwe de ji ber sirûştê zivir, ji ber ku yê neçare pişt bi dîngê bilind bibestî, çunkî ew take amraze dengê wî bigehe wan kesên ku wî divêt gazî biketê, lê kesên ku li bajarên û deştê dijîn ne dinaçarin pişt bi bilindîya dengî bibestin ji ber hebona amrazên gehandinê yê hevçerx û husa xwe ji dengên bilind û zivir dur têxin. Û hinek zana mîna (Jesperesen) berhingarîya evê bûçûnê dikan, wesa hizir dikan ku ew bûçûneke zanistî nîne, û dibêje ew dîyardeye bibe ku li nawçeyên deştî jî de hebe. (Ferîde Ciwadu, 2014 : 17-18).

1.10.1.5. Hekarê Mişextbûnê(Penaberî)

Mişextbûn yan penaberî jî dibe egerê guherîna zimanî û dengên zimanî. Mişextbûn ji egerê şerî û dagîrkirina welatî rû dide, anku li demê şer li nava welatî berpa dibe yan welatê dagîrkirinê ji alîyê hêzeke derekî ve tê dagîrkirin xelkê welatî penaber dibe û welatê xwe bicî dihêle, û di encamê de mîlmilana zimanî rû dide, vê mîlmilanê jî du encam hene, yekem xelkê penaber wê zimanê xwe biguhere û zimanê

nawçeya nû wedigire, duyem xelkê nawçeya nû dest ji zimanê xwe berdide û zimanê penaberan wergire û bikar bîne. (Ebdullsebor Şahîn, 1993 : 192). Minak bo a yekem, li demê xelkê Kurdistan li dawîya çerxî bîstî mişextbûne welatê Îranê, bi taybetî ewên li navrast û bakûrê Îranê akincî boy hemûyan zimanê Farsî wergirt û di jîyana xwe ya rojane de bikartîna, ta vegeryan welatî her di berdewam bûn li ser zimanê navbirî. Minak bo a duyem, li demê Normandîyan beşekê zorê axa Îngiltere dagîrkirî û welatîyên Normandîyan çûne Îngiltere, ji ber ku jumareya Normandîyan kêmtir bo ji jumareya xelkê wê deverê, ji ber vê yekê tevaya xelkî bi Ingilîzî di axiftin çî Normandî bin û çî Ingilîz bin. (Ebdullsebor Şahîn, 1993 : 193).

1.10.2. Hokarên Zimanî

1.10.2.1. Yasaya Dengê Bihêz

Zimanvanê Ferensî (Maurice Grammont) yasayeka binav û deng ya danay bi nave, yasaya bihêz (Law of the Stronger), li gor vê yasayê, li dema ku du fonîm bandorê li ser êk diken, bi her rêkekê bît, fonîma bê hêz (li gor cihê wê di birgê de yan li gor hêza wê ya bilêvkirinê) ji alîyê fonîma bi hêz ve dê bandorê li ser peyda bît û dê guherît. (Talîb Husên Elî, 2015 : 103).

1.10.2.1. Hokarê Lezkirinê Di Axiftinê De

Lezkirin di axiftinê de hinek caran dibe egerê guhrînê, eve jî ji encamê wê çendê rû dide ku kesê guhdar axiftina wî nebirît, yan jî axiftinker dixwazît diderdîrînê de kêmtirîn wizê bikar bihînt, ku ev lezatîye zêdetir di axiftina rojane ya xelkî de xweya dibe. (Talîb Husên Elî, 1989 : 49).

1.10.2.2. Hokarê Dubarebûnê

Di van salane de hinek vekoler egerê guherîna dengî diden pal dubarekirina fonîman, anku aw fonîmên ku zor dubare dibin ve di bikarînan zimanî de, zêdetir tî wergirtin û bi sanahîtirin û pitir di hizra mirovî de dimînin ji ewan fonîmên ku kêmtir dubare dibin, û her wesana gurankarî û asankirin pitir li ser wan fonîman dihêt ewên zor tîne dubarekirin, wate kêmtir guherîn li sere wan fonîman da tî ewên kêmtîne dubarekirin. (Talîb Husên Elî, 2015 : 104). Anku hindî fonîm zortir bêt

bikaranîn egerê guherînê zêdetire û berûvajî hindî fonim kêmtir bê bikaranîn egerê guherînê kêmtire.

1.10.2.3. Hekarê Asan Bûnê û Bandora Wê li Ser Guherîna Dangan

Her weke me berî niha amaje bi evê hekarê day. Ziman di pêşveçûna xwe de ber bi sanahîbûnê ve diçe, anku bizavê dike xwe ji dengên zehmet dûr bêxît û diguherît bi dengên din, ku pêdvî bi mandîbûnê nebin di derbirînê de. (Rebîh Emar, 2007 : 147).

1.10.2.4. Hekarê Bandora Zimanê Dewrûber Li Ser Zimanê Kurdî

Bandora zimanî pêdvîyatûyeke roşenbîrî dîrokî ya bêşike, gelek barûdox û eger yê hey ku vê bandorê disapînin, ev bandore ne tenê li ser asta zimanê me ne lê li ser asta gişt ziman û miletan de ewên rabî ser pê û bizava pêşkeftina zanistî kirî, û têkêlî ya civakî û şaristanîya mirovî di hemî çerxan de. (Zeyneb Mexloqî, 2011 : 2). Zimanên mirovan di nav hev de têkelin ji egerê têkhelebûna mirovan ji ber vê yekê deng jî di nava miletan de tên û diçin weke veguhstina mirovan di çarçûvê dinyayê de. Bo mînak çûna hinek peyvên Erebi bo nav zimanên Ewropî û belav bîn di nava zimanên wan de û ta niha jî bikartînin, lê bi hinek destewajeyên din ên xerîb û dûr ji wateya wan, ji wan peyvan jî peyva (الكحول), ku bi rîka zimanî Îspanî çûye di nava zimanên Ewropî de lê destewajeya (Spirits) bikartînin, û paşê vegerya rojhelatê û tête bikarînan di zimanê zanistî yê nû de û Erebi jî weke bikarînana Ewropî bikartînin, û bû zimanê Farsî û Turkî ji bi heman awa. (Zeyneb Mexloqî, 2011 : 25-26). Piştî hatina îslamê û di navbera salên 600 – 1000ê mişextî bi taybetî zarên jêrfiyên Kurdî hemî /V/ hatîne guherîn û bîne /W/ heblê li jêr bandora fonetîk û zimanê Erebi, ev guherîne rudaye. (Fazil Omer, 2004, 63). Ev guherîne ji dizivrin bo bandora zimanê Erebi li ser zimanê Kurdî .

Peyvên zimanê Kurdî di kirmancîya jorî de bi /V/ bikartên lê di kirmancîya jêrî de /W/ bikar tê:

Av ___ Aw

Avedan ___ Awedan

Evîn ___ Ewîn

Herçenede babetê vekolîna me yê girêdayî kirmancîya jûrîye devoka devera Amêdîyê, lê ji bo pitir ronkirin û zaîna guherînên dengî neçarîn tîşkê bêxîne ser hinek mînakên din li dîyalîktên din yên zimanê Kurdî .

Erebî	Kurdî	Farsî (Pehlewî)	Kurdî
Debt	Zewtkird – Zevtkir	Sebzî	Sewze
Ġeđeb	Ġezef – Ġezeb	Tab	Tav – Taw Hetav – Hetaw

(Fazil Omer, 2004 : 57).

1.11. Yasayên Bandora Zimanî

Peyva yasayên bandora zimanî di nerîtên zanistî de danaye ser sermaye yê gelemperî ên zimanî ewên peywendîya sedeman ji bo sedemên wan xweya diken. (Elî Ebdullwahid Elwafî, 2004 : 17). Û ewên girêdayê bi bandora zimanî ku dîyardeyeke ji bûyerên zimanî, ku zimanvan negehiştine çî yasayên taybetên girêdayê bi evê dîyardeyê ve bi wateyek rast û drust, tenê di beşek taybet bi vekolînên zimanî de nebît ku dibêjnê (Fonetîk). (Zeyneb Mexloqî, 2011 : 29).

Bandora zimanî rû nadet îla piştî bûrîna mîlmilaneke dirêj, û lêkdaneke tund, ku ew jî dibin çar cure:

1- Hatina peyvan(wergirtina wek xwe): Merem bi hatina peyvan ewe ku her peyvek ji zimaneke din bihête di nava zimanê pêşwazîker de, di herdemekî de hatibin û ta niha bêne bikaranîn. (Zeyneb Mexloqî, 2011 : 29). Di evî curey de peyv weke xwe di mîne û wêne û dengên peyvê çî guherîn bi ser de nahên. Weke: (**Stratîjî , Mobayl , Ofis**). (Ebdullselam Necimeddîn Ebdulla û Şêzad Sebrî Elî, 2011 : 286).

2- Wergêrana peyv bi peyv: peyv li ser beşên pêkhênerên wê de tê dabeşkirin, û her pişkek bû zimanî xweyakirî tê wergêran. Weke:

Lehim ‘ecîn ____ Hevîrgûst

Ĥumq bĥîn ____ Arênoka

Muxric ____ Derhêner

Mihafiz ____ **Parêzgar**. (Ebdullselam Necimeddîn Abdulla û Şêrzad Sebrî Elî, 2011 : 286).

Di evê xalê de wesa xweya dibe kû dema peyvek ji zimanekê diçe nava zimanekê din de û bi wateyeke din bit bikaranîn, ji aliyê dengî jî ve guherîn bi ser de tèn kiraseke pêşwazîker dîken ber wê peyvî û weke peyvek ji peyvên zimanê pêşwazîker lê tê. (Zeyneb Mexloqî, 2011 : 29).

3- Derbirîna wergêrayî: Peyva bîyanî nahê wergêran lê tê derbirîn (te'birîkirin).
Weke:

<u>Buzurg</u>	<u>Daşt</u>
Derbirîn	derbirîn
↓	↓
Berz	Nirxandin
Berz	Ragirtin

4- Têkelkirina peyva bîyanî û pêşwazîker: Li vir de beşek ji peyvê bîyanî ye û beşê din ya zimanê Kurdî ye weke zimanî pêşwazîker. Weke:

Xwedanê îmtiyazî

Pilan danan. (Ebdullselam Necimeddîn Abdulla û Şêrzad Sebrî Elî, 2011 : 286).

Beşa Duyem


2. Guherîna Dengan Li Nava Axiftinkerên Devera (Amêdîyê)de

Her zimanek xwedî komek yasa û destûr e, û merema serekî jî ji vekolînên zimanî destnîşan kirina van yasa û destûrane, di çarçovê zimanekê dîyarkirî de. Fonîmên her zimanekî ku di pêkhatayên birgê û peyvê û hevokê de bikartên bandore li hevdu diken, ji ber vê yekê guherîn rû diden, yan jî bi wateyeke din ji encamê wê pêkhateya dengî ewa tê bikaranîn, li jêr bandora taybetmendîyên fonîmî ên derdor dibe egera guherîneke taybet di bilêvkirinêde. Bo mînak dengên dengdar ên rawestîyay ên kip li despêka birgê bi taybet pêşîya dengdêran bi taybetmendîyeke bi hêz û bi taybetmendîyeke dengî a xweyakirî tê bi lêvkirin, weke (por), (tor). (Mehdî Mişkoheddînî, 1377/1998 : 129).

Bi awayeke gelemperî mebest ji guherînên dengî, ewan guherînên ku bandorê li ser çewanî û çendayetiya fonîman dikin vedgirî û eve jî dizivîrîve ji bo egera nêzîkî yan bandora fonîmên din, ku di bêjne van guherînan yasayên fonîmî yan guherînên dengî. (Sasan Sipinta, 1379/2000 : 123).

Yan jî her guherînek ku bandorê ji aliyê cûr û cih û jumareya fonîmên pêkhateya birgê biket dibêjnê yasayên fonîmî (PHONEMIC PROCESS). (Mêhrî Baqirî, 1380/2001 : 114).


Yekeyên dengî gelak caran piştî ku bi awayê birgê derdikevin û ji encamê hatina wan di gel birgeyên din tûşî guherînan dibin, û ev guherîne bi awayên cuda cuda xweya dibin. (Eli Muhemmed Heqşinas, 1383/2004 : 136). Bo mînak (Bigre) dema ku yekeyek din yan morfîmeke din weke (Ra) yan (Da) bo tê zêdekirin, piştî lêkdanê (B) tê ladan weke (dagire) yan (ragire).

Guherîn di yek dem da di hemî peyvan de rûnadet, lê belê bi derbaz bona demi pêngav pêngav di be ku hemî peyvan bi xwe ve bigirî, weke sêvên darê ku hemî bi hev nagehin lê di maweyekî de digehin, dema em vê guherînê di hêlkaryê de nîşan dideyn awayê () werdigirî. (Ebdullselam Necimeddîn Ebdulla û Şêrzad Sebrî Elî, 2011 : 292). Ev guherîne li qonaxekê bi hêz dikevî lê hemî peyvan venagirî, li destpêkê di hinek peyvan de herdu bilêvkirinên kevin û nû tîk bikaranîn û bi vî awayî berdewam dibe ta ku bilêvkirina nû zal dibe.

(xweş ___ xoş)

(xûn ___ xwîn ___ xîn)

(xwandin ___ xwîndin ___ xîndin)



hêlkarîya 4 astê guherîna peyvên

Fonîm di hinek derdorên dengî de bandorê li hev du diken û di encam de tûşî guherînekê dibin, sîmayekê dengî ji dengê bo dengê din ê cîranê xwe tê veguhestin û dibe eger ku ew deng li dîf derdorê dengî ê xweyakirî bi awayeke cudatir bê bilêvkirin. Herwisan hinek derdorê dengî guherîneke dengî ya taybet berhem bînin. (Şêrzad Sebrî Elî û Ebdullselam Necimeddîn Ebdulla, 2019 : 173).

2.1. Kurtîyeke Dîrokî Li Dur Devera (Amêdîyê)

Deverdarîya Amêdîyê yeke ji her heft deverdarîyên parêzgeha Duhokê û mezintirîn deverdarîye li gor pêkhateya wê ya kargêrî, ji şeş nahîyên (Amêdî, Dêrelok, Kanî masê, Sereing, Bamernê, Çemankê) pek tê. Dikevîte bakûr û bakûrê rojhelatê parêzgeha Duhok, hev sinûre di gel komra Turkîya, rûbarê (Rûyê şîn) weke sinûreke xwezayîye di navbera parêzgeha Duhok û parêzgeha Hewlêr de ji aliyê rojhelatê ve, ji aliyê rojavay ve rûbarê Xabûr wê ji deverdarîya Zaxo cuda diket, başûrê wê deverdarîya Şêxan e, başûrê rojhelata wê deverdarîya Akrê û başûrê rojavayê wê deverdarîya Duhok e , (Neşwan Şûkrî Ebdulla û yin din, 2013 : 13). Rûberê gelemprî yê deverdarîyê (2582 kîlometrên ducarkî) ye. (Selwa Ferîq Salih, 2017 : 24).

Nahîya Amêdîyê

Amêdîyê dibe navenda deverdarîyê. Amêdîyê giringîyek taybet heye û bernîyase bi dîroka xwe ya dirêj, navê wê di nivîsînên Aşûrî yên kevinde û di tûmarên melikê Aşûrî (Şemsê Add) yê pêncan hatîye wek (Amat) yan (Amadî). (Kawe Ferîq Ehmed, 2000 : 25). Amêdî weke cih, bajêrekê kevnare û cihê wê kelaye, dikeve bakûrê rojhelatê parêzgeha Duhok, rûbrê navenda deverdarîyê (93 kîlometrên ducarkî) ye, bilindîya wê li ser asta deryay ji (1400 metr)an bilindtîre, (80 kîlometr)an ji bajarê Duhok dûre, hijmara akincîyên wê nîzîkî (10187) kesane. (Selwa Ferîq Salih, 2017 : 24). Akincîyên wê pitir amêdîyên kevinin.

Nahîya Dêrelok

Ev nahîye dikeve rojhelatê navenda deverdarîyê bi duratîya (15 kîlometr)an, rûbrê wê (1035 kîlometrên ducarkî) ye, di berê de bo nava nahîya (Nêrwe Rêkan) dihate naskirin, piştî sala (1979)ê tevaya xelkê Nêrwe Rêkan bi zorî hatine veguhestin, nahî jî hate veguhestin bo civakgeha Dêrelok, xelkê nawçeyê ji musilman û kiristîyanan pêk tê, hijmara akincîyên wê nîzîkî (52231) kesane. (Selwa Ferîq Salih, 2017 : 34-35). Eşîretên akincîyên wê pitir (Nihêlî, Rêkanî, Nêrweyî, Duskî Jorî)ne.

Nahîya Sersing

Sersing li derdurên sala (1948)ê hatîye avakirin, û li sala (1952)ê bûye navend nahîyê, ev nahîye dikeve rojava navenda deverdarîya Amêdîyê bi duratîya (18 kîlometr)an, rûbrê nahîyê (271,8 kîlometrên ducarkî) ye, (60 kîlometr)an ji bajarê Duhok dûre, bilindîya wê li ser asta deryay ji (1050 metr)an bilindtîre, xelkê nawçeyê ji musilman û kiristîyanan pêk tê, hijmara akincîyên wê nîzîkî (52231) kesane. (Selwa Ferîq Salih, 2017 : 35). Eşîretên akincîyên wê pitir (Berwarî, Duskî jêrî, û beşeke kê m jî Duskî Jorî)ne.

Nahîya Kanî Masê

Nahîya Kanî Masê ku digotinê (Berwarî Bala), dikeve bakûrê navenda deverdarîya Amêdîyê bi duratîya (35 kîlometr)an, rûbrê nahîyê (610 kîlometrên ducarkî) ye, li sala (1928)ê hatîye damezrandin, xelkê wê ji du olên musilman û kiristîyanan pêk tên, nahîya Kanî Masê ji alîyê rojhelatêve dikeve devera Nêrwe û


rûbarê Zê, ji rojava dikeve nahîya Batûfa û rûbarê Xabûrî, ji alîyê başûr ve dikeve Amêdîyê û nahîya Bamernê û ji alîyê bakûr ve dikeve ser sinûrê Turkîya, hijmara akincîyên wê nîzîkî (10616) kesane. (Selwa Ferîq Salih, 2017 : 35). Akincîyên wê ser bi eşîreta (Berwarî Bala)ne.

Nahîya Bamernê

Bamernê weke navend di keve singê çîyayê Metîn, li alîyê rojavaya bajêrê Amêdîyê ye, bi duratîya (20 kîlometr)an, xwe cihên wê ji musulman û kiristîyanan pêk tên, rûbrê nahîyê (230 kîlometrên ducarkî) ye, Bamernê û gundên ser bi wê ve gelek cihên şîwarî lê hene, weke (Kela Şêxo, Dêra Eredina, Kela Erizê) û gelekên din, hijmara akincîyên wê nîzîkî (7601) kesane. (Selwa Ferîq Salih, 2017 : 35-36). Akincîyên wê (Bamernî û Berwarî Bala)ne.

Nahîya Çemankê

Ev nahîye dikev başûrê rojhelata deverdarîyê, devera eşîreta Berwarî Jêrîya ne, rûbrê nahîyê (300 kîlometrên ducarkî)ye, xelkê wê ji du olên musulman û kiristîyanan pêk hatîye, li roja (19/2/2000)ê biryar hate dan ku Çemankê bibe nahîye, hijmara akincîyên wê nîzîkî (5568) kesane. (Selwa Ferîq Salih, 2017 : 36). Akincîyên wê eşîreta (Berwarî Jêrî)ne.



Nexşê 1 deverdariya Amêdiyê

Nexşe ji karê vekolê, Arc GIS 10.4, bi hevkarîya Radhwan mikael Ameen, xwîndekarî beşa cografîyê li zanîngeha wan yuzunci yul, 2019.
 Çavkanî: Hikûmeta Herîma Kurdistanê Wezaretê Pilandanan, Rêveberîya Amara Duhokê, Rêveberîya Zanyarî û Nexşesazîyê Pişka DAM , GAS, Pirofaylê Qezayan, Datayên Nebelavkirî

2.3. Guherîn Dî Dengên Dengdêr (VOWEL) De

Di encamê lêkdana du morfîman yan peyvekê digel morfîmekê, ku du dengdêr li dif yek bên, çend guherînekên fonîmî di morfîman de ro diden. Bi wateya ewê ku morfîm awayê cuda werdigrin, li gor ewê jîngeha cuda cuda ku têda derdikevin, egerê guherîna dengdêran di zimanê Kurdî de bi zorî bu wê yekê di zivîrî ku du dengdêr yan pitir li dif yek da ne ên. (Talîb Hosên Eli, 2015 : 130-131). Her wisan guherîna dengdêran bi zorî ji du diyardeyên (neguncan û jinavçûn)ê de xweya dibin û berçav dievin. (Talîb Hosên Eli, 2015 : 132). ku her di vî beşî de dê behsa van bûyeryan ête kirin.

2.3.1. Peyda Bûna Dengî

Peyda bûna dengê dengdêr zor kê m xweya bibe bi tenê di çend barûdoxên kê m de tê dîtîn ew jî bi awayeke yekcar sist. (Dilber Îbrahîm Ferec Şalî, 2000 : 88).

Weke:

Xal — Xalo

Der — Derê

Met — Metê

Çar — Çare

Guman têde nîne ku hinek dengdêrên weke (E) di navbera peyvên hevedudanî de peyda dibin weke (Mêrgesor , Guleberûj , gulegenim , Mêrgemîr), û dengdêrên (A) û (Ê) di girêyên navî de ji bu destnîşan kirina zayendê navî tîn bikaranîn, weke (Kîça min , Kurê min). (Dilber Îbrahîm Ferec Şalî, 2000 : 88). Ev cûreyê dengdêran bi peyda bûna dengî nahên hijmartin, ji ber ku (E) navgire, û (A) û (Ê) nîşaneyê zayendê nêr û mê ne di kirmancîya jûrî de.

2.3.2. Ji Nav Çûna Dengî

Di zimanê Kurdî de dîyardeya kurtkirina dengdêran bi taybetî dema ku du morfîm yan pitir diçine ser yek rû dide, ew jî ji ber wê yekê da ku dîyardeya dîvtûng rû nede. Ji ber ku di zimanê Kurdî de dema du dengdêr di gehin hev yan dengdêrek ji nav diçît yan jî dengdarek dikeve navbera herdu dengdêran de. (Dîyar

Ebdullkerîm Seîd Halo, 2011 : 97). Anku dema du dengdêr li du hev hatin dibe ku yek bê ladan yan jî dengdarek di navbera herdu dengdêran zêde bibe, li vir em dê behsa ladanê keyn. Evê jî dê dinava xalên jêrî de xweya keyn:

A- Ji nav çûna dengê /E/: Di evan xalên jêrî de xweya keyn:

- 1- Dema ku mofîma kumkirinê (AN) diçe ser peyvekê ku dawîya wê dengdêra /E/ be, dê /E/ jî nav çît, ji ber ku dengdêra bi hêz a bêhêz jînav dibet. (Dîyar Ebdullkerîm Seîd Halo, 2011 : 97). Weke:

Perde + an — Perdan

Name + an — Naman

Pencere + an — Penceran

- 2- Dema nîşaneyê nenasîyarîyê (EK) diçe ser wan peyvên ku bi dengdêra /E/ bi dawî tên, dengdêra /E/ dê jî nav çît. (Dîyar Ebdullkerîm Seîd Halo, 2011 : 97-98). Weke:

Name + ek — Namek

Pale + ek — Palek

Şîşe + ek — Şîşek

Peyale + ek — Peyalek

- 3- Ji nav çûna dengê /E/ li destpêkê: Ev cûre jî nav çûne tenê di cihnavên nîşane de rû dide. weke:

Ewan — Wan

Evan — Van

Ewî — Wî

Evî — Vî

Ewê — Wê

Evê — Vê. (Sadiq Bihaeddîn Amêdî, 1987 : 132).

Hejî gotinê ye ku ev herdu cûre li devera (Amêdîyê) bi hevra tên bikaranîn.

Egerê ji nav çûna vî dengê jî vedgerît bo hokarê fonolojîyê, ji ber ku di yek birge de du dengdêr bi hev re na ên, ji ber wê yekê da ku bûyerya dîvtûngî çênebe, yan dengdarek peyda dibe yan dengdêrek ji nav diçe bi taybetî dengê /E/ demê ku dengdêreke din tete pal, ev /E/ ye ji nav diçît. (Ewrehmanê Hacî Marif, 1976 : 54-55). Em wesa bo diçîn ku ew /E/ ya ji nav çoy ya (EK)e, ji ber ku eger /E/ ya peyvê ya resene û ji nav çûna wê dê wateya peyvê hêt guherîn, ji ber wê yekê /E/ ya (EK)ê ji nav diçît.

Herwsa di rênivîsa Kurdî ya tîpên Erebî her dema tîpek dengdêr li desoêkê hat dengê (hemze) (◌) peyda dibe, ji ber ku di bilêvkirina dengdêran de dev yê vekirîye û hewa bê hîç asteng der dikeve. Ji bo vê meremî Ebdulla Husên Resul (2004 : 2-3) dibêje: Eger dengdêr kefte destpêka peyvê pêtvî bi berbestekê ye da ku heway vegrît, eger ne berî axiftinker dest bi axiftinê biket, piraniya hewayê pengîyayî yê xwarê dê ji sîhan derkevît û kiriyara timam kirina peyvan dê ya giran bît, peydabona (hemzê) (◌) bera wê dengdêrê ya ku li despêka peyvê têt, di zimanên din jî de heye û dîyardeyeke fonetîkîye nek fonolojî. Wate ev denge fonîm nîne tenê rolê fonetîkî ye hey.

B- Ji nav çûna dengê /Î/: demê ku cihnavê (ÎN) li ser karekî zêde bikeyn û dawîya karî tîpa (Î) bît, dê (Î) ji nav çit. (Dîyar Ebdullkerîm Seîd Halo, 2011 : 98).

Weke:

Kirî + î — Kirîn

Revî + î — Revîn

Dizî + î — Dizîn

Girî + î — Girîn

Herwesan di evan minakan de ji nav çûna dengê /Î/ vedgrît bo hokarê fonolojîyê ji ber ku di yek birge de du dengdêr bi dîf yek re na ên, da ku dîyardeya dîvtûnkî çênebe dengê /Î/ ji nav diçît.

2.3.3. Yekbûna Dengî:

Yan hinek cara bi lêkdana dengî tê bi navkirin, lêkdana dengî ji lêkdana du denga yan jî têkelkirina du fonîman ji bo peyda bona fonîmeka nû. (Şêzad Sebrî Elî û Ebdullselam necmeddîn Ebdulla, 2019 : 190). Weke

Xwe — **Xo** (we __ o)⁽¹⁾

Dixwem — **Dixom** (we __ o)

Peyrew — **Pêrew** (ey __ ê)

Xwandin — **Xîndin** , **Xandin** (wa __ î)

Xweli — **Xûli** (we __ û)

Neynnûok — **Nînûk** , **Nênik** (ey __ î)

Dewlik — **Dulik** (ew __ û)

Di mînakên serî de weha xweya dibe ku du deng hatine lêkdan û herdu pêkve bone dengeke serbixwe, ev dîyardeye li devera (Amêdîyê) bi zelalî tê guh lêbûn.

Hejîye bibêjîn hinek caran li demê axiftinê kurt boneke weha rû dide ku tomar kirina wê bi nivîsînê karekê hêsan nîne, û cure û rêjeya kurtbûnan jî ji şêwezarekî bu şêwezarekê din tê guhertin.

2.3.4. Pêk Guherîna Dengan:

Merem ji evê bûyerya guhernê ewe, dengê bi dengeke din bê guherîn bê ku wateya peyvê bihête guherîn. (Daivd Crystal, 2003 : 305). Di nava deng sazîyêde hinek caran zaravê (guherîna dengî) jî li cihê (pêk guherîna dengî) tê bi karanîn. pêk guherîna dengî jî bi vê awayî dê xweya keyn:

1- Guherîna dengê /U/ bo dengê /I/ weke:

Guhîşk — **Gihîşk**

2- Guherîna dengê /E/ bo dengê /A/ weke:

Lendik — **Landik**

Dehwet — **Dewat** — **Dawet**

Sanehî — **Sanahî**

Ronehî — **Ronahî**

⁽¹⁾ hejîye bibêjîn ku ev mînakên em bi kar tînin hinek ji wan herdu li devera (Amêdîyê) hene weke (xwe û xo) ji ber ber firehîya deverê û zorîya êl û eşîretan.

Bilindehî — Bilindahî — Bilindayî

Têde — Têda

Vêkre — Vêkra

Chide — Chida

Têkde — Têkda

Jûrdehî — Jûrdahî

Cente — Cante — Çante.

3- Guherîna dengê /I/ bo dengê /E/ weke:

Dibim — Dibem

Dikim — Dikem

Nisax — Nesax

File — Fele

Têkil — Têkel

Hivde — Hevde

Hijde — Hejde. (Delal Ehmed Salih, 2011 : 42).

Hilkeft — Helkeft

Dibit — Dibet

4- Guherîna dengê /E/ bo dengê /I/ weke:

Hejandin — Hijandin

Selal — Silal

Tevir — Tivir

Moxel — Moxil

Teraşîn — Tiraşîn

5- Guherîna dengê /U/ bo dengê /Î/ weke:

Sund — Sînd

Xuşk — Xîşk

Dumahî — Dîmahî

Hurde — Hîrde

6- Guherîna dengê /Û/ bo dengê /Î/ weke:

Nûjen — Nîjen

Nûbar — Nîbar

Mûsil — Mîsil

Xanû — Xanî

Şûtik — Şîtik

Xatûn — Xatîn

Dûr — Dîr

Hûr — Hîr

Tûj — Tîj

Parû — Parî

Kulû — Kulî

Herwesan hinek caran dengê /Î/ dibe dengê /Ê/ weke (Nînuk , Nênik), di evê mînakê de dengê /Î/ hatîye guherîn bû dengê /Ê/, û herwesan dengê /U/ hatîye guherîn bû dengê /Î/.

7- Guherîna dengê /I/ bo dengê /Î/ weke:

Sivande — Sîvande

Mih — Mîh

Bih — Bîh

Rih — Rîh

Dih — Dîh

8- Guherîna dengê /A/ bo dengê / Ê / weke:

Hisab — Hisêb

Kitab — Kitêb

Çakkirin — Çêkirin

Harî — Hêra

Raber — Rêber

Taş — Têşt

Lihaf — Lihêf

9- Guherîna dengê /Ê/ bo dengê /A/ weke:

Nihêl — Nihal

Zavê — Zava

Êsin — Asin

Çîyê — Çîya

Nên — Nan

Melê — Mela

Fêm — Fam

Nêv — Nav

10- Guherîna dengê /A/ bo dengê /E / weke:

‘aşîret — ‘eşîret

Kaku — Keku

Dahol — Dehol

Serad — Sered

Mahîn — Mehîn

Cante — Cente

11- Guherîna dengê /U/ bo dengê /Î/ weke:

Zu — Zî

Dur — Dîr

Xun — Xîn

Buk — Bîk

12- Guherîna dengê /O/ bo dengê /Î/ weke:

Têlêfon — Têlêfîn

Dîsan li devera Amêdîyê kêman dengê /I/ tê guherîn bo dengê /Î/, weke vê mînakê (Sing — Sîng), ku ev herdu peyve li deverê tînan bikaranîn. Lê peyva (Şîrîn) ku dibête (Şîrîn) ya berûvajî ya, anku dengê /Î/ tê guherîn bo dengê /I/. herwesan dengê /E/ tê guherîn bo dengê /Î/ weke (Medya — Mîdya). Yan jî dengê /U/ tê guherîn bo dengê /Ê/ weke (Lulav — Lêlav).

2.4. Guherîn Di Dengên Dengdar (CONCONANT) De

Hinek ji wan guherîna ku bi ser dengdaran de tînan li demê lêkdana du morfîman yan zêdetir, ku di herdu astên fonolojî û morfolojîyê rû diden, û bi guherîna (Morfofonolojî) tê bi navkirin, ku ji encamê guherîna fonîman di nava morfîman de rû didet û ber çav dibin. (Talîb Husên Eli, 2015 : 106). Anku weha xeya dibe ku fonîman bi tenê nahê guherîn, lê dinava morfîmê de guherîn dengê rû dide ji ber wê yekê dibêjnê guherîna morfofonolojî.

Derbarey guherîna dengdaran jî dikarin di çend bûyerên dengê bi rûnkirin û mînakên pêtvî bi vî awayî behis bikeyn:

2.4.1. Guncan_ ASSIMILATION

Yasaya guncanê pêkhatîye ji bandora dengê li ser dengê din, ji ber ku: Guncan pêk têt ji guherîna dengê ji bu wê yekê da ku bi dengê cîranê xwe biçît. Merem ji guncanê sanahî kirina bilêvkirinê ye, herwesan egerê rudana vê bûyerê bi gelemperî vedgerêt bu barûdoxê endamên bilêvkirinê û rêkxistin û guncana livînên masûlkan li dema bilêvkirina dengên de, ev kiriyare dibe egerê peyda bûna guncanê

di nava dengên hevsû de, ku bi çend yasayên fonolojîyê têne destnîşan kirin û cuda kirin. (Talîb Husên Eli, 1989 : 49).

Guncan ji çalaktirîn pirosêsên fonolojîyê ye, ku bi rêya ewê dengê sîmayekê yan çend sîmayekan ji dengê ciranê xwe werdigirît û lêkçûna even herdu dengan pitir dibe. (Şêzad Sebrî Elî û Abdullselam Necimeddîn Abdulla, 2019 : 174).

Herweswn ji alîyeke din ve guncan bi awayeke din tê pênase kirin: Yasaya guncanê bi hevkarîya bandorên fisyolojîya axiftinê rûdidet, ew jî ji ber wê yekê ye ku hêz û şeyaneke kêma bikartînin bû axiftinê. (Dîyar Abdullkerîm Seîd Halo, 2011 : 75). Yan jî guncan pêkhatîye ji du fonîman evca çî du dengdêr bin yan du dengdar yan jî du dengdêrek û du dengdarek bît di yek birge de, ku bandorê li hav du diken û wek yek lê tên. (Mêhrî Baqîrî, 1380/2001 : 114).

(Crystal) evê pirosêsê bi bandora zincîreyaka dengî li ser zincîreyaka din ya dengî dibînît. Ev bandore bi awayekî ye ku deng ta radeyekî wekhevin yan jî bi tamamî wekhevin; wate dema zincîreya axiftinê tê şirove kirin, pirosêsa guncanê weke rêyek ji bo peyda bûna rehwanî û awazdarîya axiftinê tê hijmartin. Guncan girêdayî şeyana zimanî ye û bi rêya yasayên fonîmê tê şirove kirin û amajê bi wan guherînan didet ku bi ser sîmayan de tên, wate pirosêsa guncanê bi pîşkek ji rêzmana taybet ya zimanî tê hijmartin, sererayê wê yekê ku di tevaya zimanan de tê dîtin. (Şêzad Sebrî Elî û Abdullselam Necimeddîn Abdulla, 2019 : 174).

Guncan bi gelek awayan hatîye dabeş kirin ku bi evan awayên li xwarê dê deyne dîyarkirin:

1- Guncan ji alîyê rêrewî ve: ew jî dibe du cure:

A- Guncana pêşrew: di guncana pêşrew de yekeyeka fonîmî bandorê li yekeyeka fonîmî ya piştî xwe dike û ewa li destpêkê cêgire û nahê guherîn û ya duyê toşî guncanê dibe, ev piroseye di dengsazîyê de bi awayê (←) ku dikevîte sere wan yekeyan û têne nîşandan. (Seyd Mehdî Sucadî Ê Alîyegerd Zeferanlo, 1393/2014 : 79). Bû minak di zimanê Îngilîzî de peyva (Dogs) dibe (dogz) li vir /S/ ji ber ji destdana sîmayê kipîyê û bi destve înan girîyê ligel /G/ hatîye guncandin. (Elî Muhemmed Heqşinas, 1383/2004 : 152). Di zimanê Kurdî de weke:

Destgirtin Dezgirtin

B- Guncana paşrew: Di guncana paşrew de yekeyeka fonîmî bandorê li yekeyeka fonîmî ya berî xwe diket û ewa lî dest pêkê tê guherîn û toşî guncanê dibe, û ya duyê cêgire û nahêt guherîn, ev piroseye di dengsazîyê de bi awayê (→) ku dikevîte sere wan yekeyan û têne nîşandan. (Seyd Mehdî Sucadî Û Alîyegerd Zeferanlo, 1393/2014 : 79). Bo minak di zimanê Îngilîzî de ronana (Is she) bi (Iz she) tê bilêvkin. (Elî Muhammed Heqşinas, 1383/2004 : 152). Di zimanê Kurdî de weke:

Merdtir Mertîr

2- Guncan ji alîyê dengdar û dengdêran ve:

Di guncanê de beşekê dengî yan hinek teybetmendîyên dengî bandorê li derdorên xwe diken, wate fonîmek bandorê li derdorên xwe diket û sazgeha drustbûna dengî dê guherît, ew jê dibin çwar beş:

- A- Guncana dengdarî digel dengdêrî.
- B- Guncana dengdêrî digel dengdarî.
- C- Guncana dengdarî digel dengdarî.
- Ç- Guncana dengdêrî digel dengdêrî. (Ehmed Ebo Mehbob, 1383/2004 : 58).

A- Guncana Dengdarî Digel Dengdêrî:

Merem ji vê guncanê ewe ku dengdêrek bandorê li dengdara berî xwe diket û teybetmendîyên xwe vedguhêzît bo wî dengdarî, ku ev yasaye jî pitir li ser van du dengdaran diçespît /K/ û /G/. (Dîyar Ebdullkerîm Seîd Halo, 2011 : 77). Weke:


1/ **Kerî**

Kêr

Gef

Gêsin

Girt


2/ **Karî**

Kur

Gaz

Gust

Gûtin

Lewra bi hêsanî di karîn cudahîyê di bilêvkirina /K/ û /G/ de di herdu desteyan de xweya bikeyn, ew ji jiber bandora dengdêraye, ku di peyvên desteya yekêde /K/ û /G/ berî dengdêrên (/E/ , /Ê/ , /I/) der dikevin, lewra berî pehinka nerim têne bilêvkin. Di heman dem de di desteya duyê de /K/ û /G/ piştî pehinka nerim têne bilêvkin. (Mehdî Mişkoheddînî, 1377/1998 : 132).

B- Guncana Dengdêrî Digel Dengdarî:

Sîmayê dengdarekî bo dengdêra cîran tên veguhastin, bo mîvak demê dengdêrek dikeve berî dengdareke difnî toşî difnîbûnê dibe. Bi derbirîneke din bi rex dengdareke difnî ve, dengdêreka helgirê sîmayê difnî tê bi lêvkin. (Şêzad Sebrî Elî û Ebdullselam Necimeddîn Ebdulla, 2019 : 179). Ev yasaye jî bi taybetî dengdara /N/ ya difnî de xweya dibe. Weke:



Zeng

Jeng

Reng

Deng

Ceng

Leng

Teng

Di van peyvên de taybetmendîyên /N/a difnî têne veguhastin bo dengdêra berî wê.

C- Guncana Dengdarî Digel Dengdêrî:

Mebest ji vê guncanê ewe ku dengdarîa kêma deng bandorê li dengdarîa gir diket û ewê jî weke xwe lê diket, bi mercekî herdu fonîm di yek sazgeh da bin. (Ehmed Ebo Mehbob, 1383/2004 : 60).

Yan jî sîmayê dengdarekî bo dengdêra cîran tên veguhastin. Guncana di girî û kipîyê de Berbelavtirîn cureyê guncanê ye, û piranîya caran jî dengdêra kip bandorê li dengdêra gir diket û dibe egera kip bûna wê. (Şêzad Sebrî Elî û Ebdullselam Necimeddîn Ebdulla, 2019 : 180). Bu minak:


Bilindtir — Bilintir


Ez sûtim — Es sûtim

Û minakên din ji her bi wî awayî

Xerîb kir — Xerîp kir

Parastin — Paraztin

Retkirin — Redkirin

Nasnav — Naznav

[Dendara kip]₊[Dendara gir]₌[Dendara kip]

Cûreyekê din yê guncana dengdarî digel dengdarî di zimanê Kurdî de heye kû ew jî bi lêvbûna dengdara /N/ e. dema dengdara /N/ dikeve pêşîya dengdarên lêvî, dengdara /N/ tê guherîn. Ewe jî di zimanê Kurdî de bi drêjîya dîrokê rûdaye û niha cêgir maye. (Şêrzad Sebrî Elî û Ebdullselam Necimeddîn Abdulla, 2019 : 180). Bu minak:

Zenbîl — Zembîl

Penbî — Pembî

Enbar — Embar

Şenbî — Şembî

Li vir de weha xeya dibe ku ew cure yê guncanê dikarît di girî û kipîyê de, cihê berhem înanê yan jî awayê berhemînanê bît.

Ç- Guncana Dengdêrî Digel Dengdêrî:

Merem ji vê guncanê ewe kû hinek caran dengdêra birgeya duyê bandore dikete ser dengdêra birgeya pêşya xwe di yek peyv de û ewê jî weke xwe lê diket. (Ehmed Ebo Mehbob, 1383/2004 : 58). Em dikarîn bibêjîn ku dengdêra birgeya yekê digel dengdêra birgeya ciran bihête guncandin. Bo mînak:

Medya — Mîdya

Şîrîn — Şîrîn

Durist — Dirist

Hilgirt — Helgirt

Bîrîvan — Bêrîvan

3- Guncana Natewaw:

Merem ji guncana natewaw ewe ku beşek yan sîfetek ji dengekî tê guherîn bo wê yekê ku biguncît di gel dengekê din, ev guncane jî dibe ku ji gelek alîyan ve bît. Weke (girî , kipî), (giranî , sivikî ,) ji bo wê yekê da ku kêmtirîn bizava fisyolojî bê bikaranîn li dema derbirînê de. (Lîyonardo Bilomfild, 1379/2000 : 435).

A- Guncan Ji Alîyê Girîyê Ve:

Guherîna dengê kip bo dengê gir ji bo wê yekê da ku ev denge digel dengê din ji alîyê girîyê ve, ev guherîne jî ji encamê peydabûna jîngeheka dengî ya kitupir peyda dibe. (Talîb Hosên Eli, 1989 : 52). Bo mînak:

Çekdar — Çegdar

Heşt,de — Hejde

Paş,gir — Pajgir

Dest,gurk — Dezgurk

Dest,gir — Dezgir

Dest,dirêj — Dezdirêj

B- Guncan Ji Alîyê Kipîyê Ve:

Mebest ji vê guncanê ewe ku dengê gir tê guherîn bo dengê kip bi merema xwe guncandinê digel dengê din ji alîyê taybetmendîya kipîyê ve. (Muhemmed Elî Elxolî, 1987 : 220). Bo mînak:

Roş baş — Roj baş

Çibkem — Çipkem

Rês kirin — Rêz kirin

C- Guncan Ji Alîyê Giranîyê Ve:

Ev dîyardeye jî wî demî peyda dibe eger digel gotina dengêkê paşya zimanî beref pehinka nerim bilind bo, wî demî dîyardya giranî yan qelewîyê li wî dengî de peda bît. (Diyar Ebdullkerîm Seîd Halo, 2011 : 81).

Ji hejîye bêjîn ku di dîylikta jorî ya zimanê Kurdî bi tenê dengên (/Î/ û /Ê/) nebin, dengên din hemî dikarin dîyardeya giran bûnê wergirn, û bi wergirtina vê dîyardeyê jî hinek wateyê diguherin û hinek wateyê naguherin. Weke:

Birîn — Bîrîn

Ta — **Ṭa**, eve wateyê diguherin. (Bayîzê Emerî, 2005 : 76).

Û ewên wateyê naguherin weke: (Xîlmet , Selte , Galte). (Sadiq Bihaeddîn Amêdî, 1987 : 116). Di evan mînakên de dengl /t/ yê qelew bandor li dengên paş û pêşîya xwe kirîye û bûyerya giranbûnê li cem dengên drust diket, lê wateya peyvê nehatîye guherîn.

Ç- Guncan Ji Alîyê Giranîyê Ve:

Ev dîyardeye wen dengên werdigirît ewên diçêkirina wan de tewjmê heway nîne, wate di wan dengên kip de ewên taybetmendîyên peqînê hey weke dengên /P , T , K , Ç/. Weke van mînakên li xwarê:

Paşê (dumahîya tiştêkî) **Paşê** (piştî demek din)

Ḳar (qara bizinê) **Kar** (şol)

Çal (bizneke çal bît) **Çal** (çaleka kwîr)

Ḳa (kaya ji genim û cehî têt) **Ka** (li kîveye). (Bayîzê Emerî, 2005 : 76-77).

T- Guncan Ji Alîyê Lêv Xirbonê Ve:

Merem ji vê guncanê ewe ku ew dengên yan dengdarên xirbon di gelde nîne li demê bilêvkirinê de ji bo wê yekê digel dengên xirbonê weke (/U , O , Ê/) de biguncin dê ber bi xirbûnê ve çin. (Talîb Hosên Eli, 1989 : 55). Weke:

Dur	Çûn	Bûn
Doz	Zom	Sor
Kur	Şul	

2.4.2. Neguncan_ DISSIMILATION

Pirosêsa neguncanê berûvaj pirosêsa guncanê ye. Di evê pirosêsê de dengê ku di yek yan çend sîmayan di gel dengêkê cîran wek heve, di ronanê de ewan sîmayên wek heve ji dest didet û sîmayekê din yê cuda werdigirît. Renge hebona navê vê pirosêsê dîyardeyeke entîke bît, ku dengê ji ber cîrana xwe sîmayekê hevbeş ji dest bidet. (Mehdî Mişkoheddînî, 1377/1998 : 136).

Yan jî bibêjîn ku neguncan ji yeke ji bûyerên guherîna dengê ye, ku ji egera serhedana vê dîyardeyê du fonîmên wek hev di birgeyekê de yan di peyvekê de weke du fonîmên cuda û neguncayî der dikevin, yan jî du fonîmên xwedî yek taybetmendî weke taybetmendîa kipî yan girî ku ji encamê vê dîyardeyê kip dibe gir û gir dibe kip. (Mêhrî Baqirî, 1380/2001 : 115).

Yan jî neguncan pêkhatîye ji guherîna dengêkê ji wan dengên wek hev, anku hatine nava dengêkê din bo van navbera herdu dengên ji bo derbirîneke siviktir, ji ber wê yekê jî ev cure guherîne ji bo wê yekê ne ku cure hevsengîyek di zimanê de peyda bît. (Talîb Hosên Eli, 1989 : 57).

Lewra em dikarîn bibêjîn dîyardeya neguncanê yeke ji wan dîyardeyan ku ji encamê bandora dengêkê derheq dengêkê din guncana xwe ji dest didet, u ev dîyardeye bi awayekê xwezayî li ser binyatê guhdarîkirinê tê ravekirin, wate hinek caran li demê guhdanê eger deng gelek wek hev bin dibe hinek ji wan ji encamê kiriyara axiftinê bîn guherîn û dengê derheq dengêkê din dikeve biwarê neguncanê de. Weke di van mînakên li xwarê de xwey:

Şoresgêr — Şorejgêr

Qîşqîj — Qîjqîj

Mişmiş — Mişmij

Du dengên wek hev di pevekê de bikar anîne û lewra yek ji wan dengan hatîye guherîn bo dengê din, û rewşeke neguncayî drust kirîye, u di van mînakên li xwarê jî de:

Hesp — Hesb

Tavge — Tafge

Zagros — Zagroz

Yaj min ve — Yaş min ve

Destbend — Dezbend

Veguhastin — Veguhaztin

Eger em lê binêrîn di peyva (hesp) de herdu fonîmên [S] û [P] kipin, ji bo wê yekê ku derbirîn bi sanahîtir be, fonîma [P] tê guherîn bo fonîma [B] ya gir û toşî neguncanê dibe. Herwesan di peyva (tavge) de [V] û [G] herdu fonîmên girin, lewra fonîma [V] hatîye guherîn bo fonîma [F] ya kip

Bu mînak di zimanê Îngilîzî de eger em binêrîne peyvên

Himin — Heaven

Marbre — Marble

Dê bînîn di mînaka yekê de herdu dengên /M/ û /N/ dengên difnî ne û digel hev diguncin, lewra /N/ê bandor li /M/ê kirîye û guhertîye bo dengê /V/. û di mînaka din jî de dengê /R/ ya duyê di payva (Marbre) de li jêr bandora yasaya neguncanê bûye dengê /L/. (Dîyar Ebdullkerîm Seîd Halo, 2011 : 85).

Herwesan di zimanê Elmanî de fonîma [T] ya li destpêka peyva (Tartuffeln) ku bi wateya (Pitate)ye, hatîye guherîn bu fonîma [K] peyv bûye (Kartoffel). (Mêhrî Baqirî, 1380/2001 : 116).

2.4.3. Peyda Bûna Dengan

Hinek caran li jêr bandora hinek sideman yekeyeka dengî li ser zincîreya axiftinê tê zêdekirin, ev pirosêse bi zêdekirina dengan ya peyda bûna dengan tê nîyasîn. Bi derbirîneke din her dema di ronana dengî de cureyekê hevnişînîyê di

navera yekeyên zimanî de peyda bibe, ku yan li gor xwezayê dengî yê zimanî giran bin, yan jî berûvajî sîstemê dengî yê ewî zimznî bin, ji bo çareser kirina evê kêşe yekeyeka dengî li ser zincîreya axiftinê tê zêde kirin. (Eli Muhammed Heqşinas, 1383/2004 : 159).

peyda bûna dengî di zimanê Kurdî de bi vî awayî dibe:

1- Peyda bûna dengê /Y/: weke

D.Din **D.A**⁽²⁾

Weran — **Weryan**

Helan — **Helyan**

Geran — **Geryan**

Tisran — **Tisryan**

Westan — **Westyan**

Diran — **Diryan**

Çeman — **Çemyan.**

Yan jî bi vî awayî:

Perde₊ên — **Perdeyên**

Qutabî₊an — **Qutabîyan**

Rê₊ek — **Rêyek**

Masî₊an — **Masîyan**

Masî₊ek — **Masîyek**

Bira₊an — **Birayan**

Rê₊ên — **Rêyên**

⁽²⁾ji ber ku vekolîna me li ser devoka devera Amêdîyê ye piranîya mînakên li ser deverê ne, lê eger me mînakên deverên din wergirtin em dê mînakên devera Amêdîyê û deverên din destnîşan keyn.

Li vir de weha xweya dibe ku her peyveka dawîya wê dengê dengdêr be, dema ku nîşaneyê (an) ya komkirinê yan (ek) ya ne nasîyarîyê yan daçêkê xistineser yê komê (ên , êt , êd) li ser peyvê zêde bikeyn, dibe ku bi navbera peyvê û daçêkê de dengdara (Y) payda bibe, yan jî hinek caran dengdêrek ji wan bê ladan.

2- Peyda bûna dengê /W/: weke

Du,a,bîne — Duwa bîne

3- Peyda bûna dengê /H/: weke

D.Din D.A

Jimart — Hejmart , Hijmart

4- Peyda bûna dengê /Z/: weke

Du,deh — Duzdeh — Dwazde — Duzde

Sê,deh — Sêzdeh — Sêzde

5- Peyda bûna dengê /F/: weke

Helkat — Helkaft

Serket — Serkeft

Daket — Dakeft

6- Peyda bûna dengê /K/: weke

Kur — kurik

Kiç — Kiçik

Kar — karik

Das — dasik

Dumahî — Dumahîk

Kutildew — Kutildewk

Kêr — kêrik

Tirar — Tirark

7- Peyda bûna dengê /D/: weke

D.Din **D.A**

Hinek — **Hinek**

8- Peyda bûna dengê /Ş/: weke

Şitî — **Şimtî**

9- Peyda bûna dengê /F/: weke

D.Din **D.A**

Rêkir — **FRêkir**

2.4.4. Pêk Guherîna Dengan

Merm ji evê dîyardeyê ewe ku di axiftina hinek kesan de dengê di peyvekê de bi dengê di tê guherîn, bê ku ev guherîne bibe sedemê guherîna wateya peyvê, yan bi wateyeka din peyv bi du morfîmên cuda bi heman wate derdikeve û dibe ev herdu forme di yek zarav de bin yan her formek di zaravekî de be. (Muhemmed Merof Fetah, 1990 : 118).

Hinek caran ev guherîne ji bo guherînên dîrokî vedigerin, merem jê ewe ku bi dirêjîta dîrokê dengê di birgeyekê de yan di peyvekê de tê guherîn bo dengê din. (Mêhrî Baqirî, 1380/2001 : 90).

Bo minak di zimanê Farsê û Kurdî de dengê /P/ tê guherîn bo dengê (/B/ û /V/):

Avêstayî **Pehlewî** **Farsî** **Kurdî**

Ververe **Verv** **Berf** **Befir**

Vate **Vat** **Bad** **Ba.** (Fazil Omer, 2004 : 90).

Wate merem ji vê guherîne ewe ku li demê peywendî kirinê dengê ji dengên peyvê tê guherîn bo dengê din, bê ku wateya peyvê biguherît.

Pêk guherîna dengan bi vî awayî dibe:

1- Guherîna dengê /P/ bo dengê /B/ weke:

Perağ — Berdağ

Pişkûj — Bişkûj

Çipkem — Çibkem

Pelatînk — Belatînk

Ġerîp — Ġerîb

2- Guherîna dengê /D/ bo dengê /T/ weke:

D.Din D.A

Bidlîs — Bitlîs

Hinard — Hinart

Jimard — Jimart — Hejmart — Ejmart

Binyad — Binyat

Tiffin — Difin

3- Guherîna dengê /T/ bo dengê /D/ weke:

D.Din D.A

Set — Sed

4- Guherîna dengê /F/ bo dengê /V/ weke:

D.Din D.A

Kefgîr — Kevgîr

Kefçik — Kevçik — Keçik — Kaçik

Hefsar — Hevsar

Mirof — Mirov

5- Guherîna dengê /S/ bo dengê /Z/, ev herdu denge li devera Amêdîyê tên bikaranîn, weke:

Xwastin — Xwaztin

Nasnav — Naznav

Es — Ez

Nebes — Nebez

Kaxes — Kaxez

Beras — Beraz

6- Guherîna dengê /Ş/ bo dengê /J/ weke:

Heşt+de — Hejde

Gêş bûn — Gêj bûn

Dirêş kirin — Dirêj kirin

7- Guherîna dengê /K/ bo dengê /G/ weke:

Çekdar — Çegdar

Bêjink — Bêjing

Sersink — Sersing

Kopîtk — Gopîtk

8- Guherîna dengê /H/ bo dengê /Ĥ/ weke:

Heştê — Ĥeştê

Hişk — Ĥişk

Heftê — Ĥeftê

9- Guherîna dengê /Ĥ/ bo dengê /H/ weke:

D.Din D.A

Ĥemî — Hemî

Qeħrî — Qeħrî

Ĥetav — Hetav

Dengê /H/ dengekê resen yê Kurdî nîne di bandora zimanê Erebi hatîye nava zimanê Kurdî de, girovê me jî bo vê çendê ewe ku ev denge di nava zimanên Hind û Ewrûpî yên nekeftîne jêr bandora zimanê Erebi de nîne. (Diyar Ebdullkerîm Seîd Halo, 2011 : 107).

10- Guherîna dengê /Ĝ/ bo dengê /X/ weke:

D.Din D.A

Ĝem — Xem

Bağçe — Baxçe

Ĝembar — Xembar

Dağ — Dax

Ĝulam — Xulam

11- Guherîna dengê /S/ bo dengê /Ş/ weke:

Test — Teşt

12- Guherîna dengê /N/ bo dengê /M/ weke:

D.Din D.A

Şenbî — Şembî

Penbî — Pembî

Tenbîr — Tembîr

13- Guherîna dengê /Q/ bo dengê /K/ weke:

D.Din D.A

Xendeq — Xendek

Qur — Kur — Teqin — Herî

14- Guherîna dengê /K/ bo dengê /Q/ weke:

D.Din D.A

Kutan — Qutan

Pakij — Paqij

15- Guherîna dengê /L/ bo dengê /J/ weke:

D.Din D.A

Lê keft — Jê keft

Lê girt — Jê girt

Lê xwar — Jê xwar — Jê xar

Lê çû — Jê çû

16- Guherîna dengê /H/ bo dengê /Y/ weke:

D.Din D.A

Werhan — Weryan

Xurhan — Xuryan

Gerhan — Geryan

17- Guherîna dengê /Ç/ bo dengê /C/ weke:

Pênç — Pênc

Çante — Cante

Çente — Cente

18- Guherîna dengê /X/ bo dengê /H/ weke:

D.Din D.A

Xûrde — Hûrde — Hîrde

19- Guherîna dengê /C/ bo dengê /J/ weke:

Ecdad — Ejdad

Wicdan — Wijdan

Kolîc — Kolîj

20- Guherîna dengê /Z/ bo dengê /J/ weke:

Dilsoz — Dilsoj

Zebeş — Jebeş

21- Guherîna dengê /W/ bo dengê /V/ weke:

D.Din D.A

Newroz — Nevroz

22- Guherîna dengê /T/ bo dengê /V/ weke:

Temirand — Vemirand

23- Hinek guherînên din weke:

Pîlik — Mîlik

Difin — Tifin

Berdax — Perdağ

2.4.5. Cih Guherîna Dangan _ EXCHAN

Hinek caran du deng di ronane de ji encame hevnişîniye cihê xwe pêk diguherin, bi awayekî ku dengê yekê di çê cihê dengê duyê û dengê duyê diçe cihê dengê yekê. (Elî Muhammed Heqşinas, 1383/2004 : 156). Eve jî ji egerê gelek bendoran rû dide, di navbera du zimanan de yan du zaran de ya di zarekî jî de tê dîtin. (Muhammed Merof Fetah, 1990 : 118). Ji bilî hindî jî ev cih guherîne hinek caran peywendî bi çîna civakî û asta rewşenbîriyê ve heye. Weke:

Xwîndevan Nexwîndevan

com'e — co'me

rubi' — ru'ib

le'net — ne'let. (Diyar Ebdullkerîm Seîd Halo, 2011 : 113).

A- Cih guherîna dengî di yek zar de weke:

Befir — Berif

Binêre — Birêne

Ji Bilî — Bijlî

Derwêş — Dewrêş

Lihêf — Hilêf

Erd — Edir

Bijartin — Birajtin

Ciran — Cînar

B- Cih guherîna dengî ji zarekî bû zareke din weke:

Kin — Nik

Ciger — Cerg

C- Cih Guherîna Dengî ji zimanekî bû zimanekê din weke:

Fanêle — Falêne

Hikomet — Hokmet

Wezi' — We'iz

Qifil — Qilif

Medih — Mehid

Borgî — Boğrî. (Diyar Ebdullkerîm Seîd Halo, 2011 : 114).

Li devera Amêdiyê ev cih guherêne hinek caran tê guhlêbûn weke van mînakên xwarê:

Bhên — Bêhin

Me‘ceme — Me‘ceme — Mecme‘e

Borgî — Boğrî

Wezi‘ — We‘iz

Medih — Mehid

Fanêle — Falêne

Qifil — Qilif

Lihêf — Hilêf

Ciran — Cînar

Kehreb — Kerheb

Dîşleme — Dîşmele

Dawet — Dewat

Pêhin — Pihên

2.4.6. Ji Nav Çûna Dengan _ DELETION

Hinek caran yekeyek li jêr bandora hinek egeran ji zincîreya axiftinê tê ladan û jêbirin. Du cûreyên ji nav çûne hene û bêtvîye ji hev bîr cudakirin, cureyê yekê ji nav çûna dîrokîye ku biborîna demî û di qonaxên cuda yê dîrokê yekeyek li gor yasayên dîrokî_zimanî yê taybet ji zincîreyên dengî yê dîyarkirî tî jêbirin. (Elî Muhammed Heqşinas, 1383/2004 : 159). Weke keftina dengê /X/ ji peyvên (xişîr = şîr , xişîv = şîv) bi drîjîya dîrokê. Cureyê duyê ji nav çûna ronane ye ku niha û li vî serdemî û li gor ew zincîreya yeke tede derdikeve û toşî ji nav çûnê dibe. (Şêzad Sebrî Elî û Ebdullselam necmeddîn Ebdulla, 2019 : 190).

Li vir de merema cureyê duyê ye, û em dikarin bi evan cureyan destnîşan bikeyn:

A- Ji nav çûna dengan li despêka peyvê:

Li despêka peyvê dengê yan zêdetir jî nav diçît ji bo derbirîneke siviktir, yan jî gelek caran dema du dengên weke hev yan li hav nêzîk diçîne serêk yek ji wan dengan ji nav diçe. (Dîyar Ebdullkerîm Seîd Halo, 2011 : 87). Anku li vir merem ji nav çonê sivikkirin û asankirina derbirîne ye. Weke:

Bibêje — Bêje

Vexwar — Xwar

Vedîtin — Dîtin

Birîne — Rîne

Frêkir — Rêkir

Biraweste — Raweste

Birêkeft — Rêkeft

Li van minakên di serî de dengdarek û dengdêrek bi hev re ji nav diçin.

B- Ji nav çûna dengan li naverasta peyvê:

Li naverasta peyvê dengê yan zêdetir ji nav diçîne:

1- Ji nav çûna dengê /B/:

Her weke xweya ev /B/e gelek caran weke nîşaneyê fermanî yan daxwazî der dikeve bitaybetî dema diçe ser karekê darêjtî yan hevedudanî dengê /B/ tê ladan û bandorê li wateyê naket. Bi vî awayî:

- Rêjeya emirî yan daxwazî weke:

Bilidbike — Bilindke — bilinke

Dabigre — Dagire

Rabigre — Ragire

Serjêbike — Serjêke

Pêbike — Pêke

Helbigre — Helgre

- Rêjeya mercî weke:

Dabigrim — Dagirim

Helbigrîn — Helgirîn

Çêbikem — Çêkem

Pêbikem — Pêkem

- Ji nav çûna dengê /B/ bi awayekê asayî weke:

Xolîbser — Xolîser

- 2- Ji nav çûna dengê /T/ weke:

Destkeft — Deskeft

Destmal — Desmal

Destgir — Desgir — Dezigir

Destdirêj — Desdirêj — Dezdirêj

Heft₊sed — Hefsed

Heşt₊sed — Heşsed

Ristik — Risik

Dustkî — Duskî

Destpêk — Despêk

Ger em berê xwe bidîn van mînakên li serî, di her sê mînakên dest pêkê dengê /T/ piştî dengê /S/ hatîye ku dengê kipe û li duf dengê /T/ dengê din yê kip hatîye, û denge /T/ jî dengê rawestîyayî ye û peyvê diket du parçe yan jî rawestîyanekê peyda diket, ji ber wê yekê namînît û ji nav diçît.

- 3- Ji nav çûna dengê /Ş/:

Ji nav çûna dengê /Ş/ di rader(çawgan) de rû dide, weke:

Firoştin — Firotin

Mêştin — Mêtin

Rêştin — Rêtin

4- Ji nav çûna dengê /V/ weke:

Kevçik — Keçik — Kaçik

Kêvrîşk — Kêrîşk

Vêca — Êca

Zivistan — Zistan

5- Ji nav çûna dengê /K/ weke:

Pakkirin — Pakirin

Çakkirin — Çakirin

Sivikkirn — Sivikirn

Ev mînakên serî hemî karên hevedudanîne, ya drust ewe ku herdu (K) hebin, lê di dema axiftinê de (K)ek tê ladan ji bo derbirîneke asantir.

6- Ji nav çûna dengê /H/ weke:

Rehwan — Rewan

Mêhvan — Mêvan

Bêhin — Bêh

Rohin — Ron

Bihêt — Bêt

Têhnî — Têhî

Dêhlik — Dêlik

Dohin — Don

Bihêle — Bêle — Pêle

Di van mînanan jî de dengên gir di gel hev hatine lewra dengê /H/ ku dengê gewîyê ye û yê girane hêzeke zor divêt bo derbirînê, lewma di van mînanan de dengê /H/ hatîye ladan, ji ber ku derbirîna dengdêran bi sanahîtire û birge jî pêtvî bi dengdêrî ye ji bo derbirînê, dengê /H/ sebarek bi dengên din gelekê girane ji kuratîya endamên axiftinê tê bilêvkirin ku berûvajî dengên (/B/ û /N/) bi sanahîtirin ji bo bilêvkirinê ji dengê /H/.

7- Ji nav çûna dengê /W/ weke:

Xawfîk — Xafîk

Mwî — Mî

Dwazde — Dazde

Xwar — Xar

Xwast — Xast

Xwand — Xand

Ciwan — Can

Xwê — Xê

8- Ji nav çûna dengê /D/ weke:

Landik — Lanik

Zendik — Zenik

9- Ji nav çûna dengê /R/:

Hejî gotinê ye ku dîyardeya ji nav çûna dengê /R/ dîyardeyeke taybete bi axiftinkerên devera Amêdîyê ve, anku rontir bibêjîn hinek ji axiftinkerên devera Amêdîyê li dema axiftinê de dengê /R/ li naverast û dawîya piranîya peyvên dernabirin û ji nav diben, lê li despêka peyvê derdibirin derbirîneke giran. Weke:

Birinc — Binc

Guhark — Guhak

Mirîşk — Mişk

Sersing — Sesing

Serdar — Seda

Pirt Pirt — Pit Pit

Were — We

Rêber — Rêbe

Warhêl — Wahêl

Rîbar — Rîba

Zêbar — Zêba

Hişyar — Hişya

Gewrî — Gewî

Di van mînakên li ser de dibînîn ku dengê /R/ yê ji nav çoy, li dema bilêvkirina van cure peyvan de dema dengê /R/ ji nav di çê bi taybetî li naverasta peyvan hinek caran awazek li cihê wî dengî peyda dibe, weke dengê /I/ tê xweya kirin lê bi awazek dirêjtir, ji ber hebûna vê awazê axiftinker û guhdar hest bi hebûna dengê /R/ diken, û li dema nivîsînê dengê /R/ weke her dengeke din tê nivîsîn, merem ji vê ji nav çonê tenê sivikkirina axiftinê ye. Herwesan hejî gotinê ye ku ev bûyerye ya girêdayê hinek axiftikerên deverê bo, lê roj bi roj ya berbelav dibe li deverê, ji ber çol kirina gundan xirvebûna xelkî di civakgehan de û tevlîhevbûna wan, ev dîyardeye ji axifinkerên hatîye veguhstin bo axftunkrên din û rû li belavbûne ye.

10- Ji nav çûna dengên din weke:

Her Roj — Heroj — Hero

Peşin — Pan

Hêlik — Hêk

Şimtî — Şitî

Dibêjim — Dibêm

C- Ji nav çûna dengan li dawîya peyvê:

Di vê cureyê ji nav çûnê de ding li dawîya peyvê tê ji nav birin yan ladan, bê ku wateya peyvê bihêt guherîn û têk biçe, evê jî merem pê derbirîneke sivike.

1- Ji nav çûna dengê /K/ weke:

Rêk — Rê

Kêrik — Kêr

Kotirk — Kotir

Dumahîk — Dumahî

2- Ji nav çûna dengê /N/:

Gelek caran dema peyvek kit bikeyn peyvek kom bi rêya morfîma (An) ya komkirinê, dengê /N/ ji bo sivik kirinê tê ladan, ji ber ku li dema nivîsînê tê nivîsan lê li dema bilêvkirinê ji nav dice. Weke:

Penceran — Pencera

Dergehan — Dergeha

Mirovan — Mirova

Hespan — Hespa

Ç- kurtkirina navên kesan:

Gelek caran jî ji encamê dîyardeya ji nav çonê navên kesayetîyê dihêne kurtkirin û pitir ji dengdarekî û dengdêrekî tên ladan. (Dîyar Ebdullkerîm Seîd Halo, 2011 : 96). Di Kurdî ya jorî de herdu morfîmên (O , Ê) hene ji bo biçûkkirina navên taybet ku hem navên Kurdî û hem navên bîyanî em dikarîn bi van morfîman biçûk bikeyn, piştî ji nav çûna çend dengekan û zêdeirina morfîma (O) bû zayendê nêr û morfîma (Ê) bo zayendê mê. (Leyla Celîl Ebas, 2003 : 114). Li devera Amêdîyê hinek caran vê yasayê dişkêne ji ber ku morfîma (O) bo zayendê nêr û bo zayendê mê jî tê bikaranîn û herwesan morfîma (Ê) jî bo zayendê nêr û bo zayendê mê jî tê bikaranîn . Merem ji vê biçûk kirinê hinek caran vedigerît ji bo du egeran, yan ji ber

nazdar kirin û vîyana wî kesî ye, yan jî ji ber kêma kirin û neviyan û sivik kirina wî kesîye. Weke:

Nav — Biçûk Kirina Nazdar Kirinê — Biçûk Kirina Kêma Kirinê

Fatîma — Fatê — Fato

Perwîn — Perê — Pero

Karwan — Karê — Karo

Remezana — Remê — Remo

Nazdar — Nazê — Nazo

Nazik — Nazê — Nazo

Gulistan — Gulê — Gulê

Xecîca — Xecê — Xeco

Dibe ku hinek caran zayeyndî ji xweya dike lê merc nîne herdem wehabe. Weke

Şêrzad — Şêro

Receb — Reco

Karwan — Karo

Şeyma — Şemê

Besna — Besê

D- Giran kirin û sivik kirina deng:

Weke me berîya niha amaje pê day hinek caran deng giran dibin yan sivik dibin, ku ew jî du cûre ye ya yekê dibe egerê guherîna wateyê û ya duyê nabe egerê guherîna wateyê, merema me jî ya duyê ye, anku em dikarin bibêjîne vê dîyardeyê guherîna fonîman bû elofonan, ku di beşa yekê de me behsa fonîm û elofonan kirîye, ku guherîne ji egerê bandora zimanê Erebî bo ser zimanê Kurdî be. Weke mînak:

Das — Daş

Pîvaz — Pîvađ

Tirŝi — Țirŝi

Sar — Ŝar

Sanehi — Ŝanehi

Tevir — Țevir

Tam — Țam

Sed — Ŝed

Masi — Maŝi

Sal — Ŝal



Encam

- Ji bo xweyakirina yasayên taybetên her zimanekî fere binemayên dengsazîyê li berçav bêwêgirtin, anku berî nîyasîna dengên zimanî, em nikarîn bigehînin ewan system û yasayên desthelatdar di wî zimanî de, ji ber ku bê behis kirina dengsazîyê dê kêmkasî di vekolînê de hebin.
- Zimanê Kurdî weke her zimanekê din ê cîhanê ber bi asanbona derbirînê ve diçe.
- Egerên zimanî mil bi milê e gerên nezimanî li devera Amêdîyê der bi guherîneke berdewam diçin.
- Li devoka devera Amêdîyê guherîna dengan di evan xalane de tê xweya kirin:
 - 1- Guncan.
 - 2- Neguncan.
 - 3- Ji nav çûna dengan.
 - 4- Lêkdana dengan.
 - 5- Peydabona dengan.
 - 6- Lêk guherîna dengan.
 - 7- Cih guherîna dengan.
- Dikarîn guncanê bi vî awayî dabeş bikeyn:
 - A- Guncana pêşrew û guncana paşrew.
 - B- Guncan ji alîyê dengdar û dengdêran ve.
 - 1- Guncana dengdarî digel dengdarî.
 - 2- Guncana dengdarî digel dengdêrî.
 - 3- Guncana dengdêrî digel dengdêrî.
 - 4- Guncana dengdêrî digel dengdarî.
 - C- Guncana natewa: Ew jî van xalan bi xwe ve digirît
 - 1- Guncan ji alîyê girîyê ve
 - 2- Guncan ji alîyê kipîyê ve.
 - 3- Guncan ji alîyê giranîyê ve.
 - 4- Guncan ji alîyê sivik bone ve.
 - 5- Guncan ji alîyê lêv xirbonê ve.

- Peyda bona dengdêrî di (3) haletan de heye.
- Lêk guherîna dengdêrî di (12) haletan de heye.
- Peyda bona dengdarî bi vî awayê li xwarê ye:
 - A- Peyda bona dengdarî bi awayeke gelemperî di (9) haletan de heye.
 - B- Peyda bona dengê (/Y/ yan /W/) di navbera du dengdêran de.
 - C- Peyda bona dengê (/Y/ yan /W/) di navbera dengdarekî û dengdêrekî de.

- Ji nav çûna dengan bi vî awayê li xwarî ye:
 - A- Ji nav çûna dengî li destpêka peyvê.
 - B- Ji nav çûna dengî li naverasta peyvê.
 - C- Ji nav çûna dengî li dawîya peyvê.

Li devera Amêdiyê ji nav çûna dengê /R/ gelek ya berbelave, ji ber ku di piranîya peyvan de yan dikarî bibêjîn di gişt peyvande ji nav diçe, tenê ger li dawîya peyvê be ji nav naçe û bi giranî tê bilêv kirin.

- Lêk guherîna dengdarî di (23) haletan de heye.
- Cih guherîna dengdarî bi vî awayê li xwarê ye:
 - A- Cih guherîna dengan di yek zar de.
 - B- Cih guherîna dengan ji zarekî bo zareke din.
 - C- Cih guherîna dengan ji zimanekî bo zimaneke din.
- Yek bona dengî jî di navbera dengdêr û dengdaran de heye

Çavkanî

- Abercrombie . D (1987), *Elmenents of General Phonetics*, Edinburgh University Press.
- Bavê Nazê (2012), *Rêzmana Kurdî (Tîyorî û Praktîk)*, Weş: Hewar, Duhok.
- Bayîzê Emerî (2005), *Dîyardên Girankirin û Sivikkirina Dengan Di Dîyalîkta Serî Ya Zimanê Kurdî da*, Govara Peyv, Hijmar 35, Duhok.
- Bazyan Yonis Mihêddîn (2013), *Peywendî Morfolojî be Astî Fonolojî û Sîntaks*, Ç: 1an, Weş: Mûkrîyanî, Hewlêr.
- Bêrarnd Kemrî û Yên Din (2007), *Ziman*, Wer: Kamil Muhemmed Qeredaxî, Ç: 1an, Weş: Wizaretî Roşinbîrî, Hewlêr.
- Celdet Alî Bedirxan (1998), *Elfabêya Kurdî Bîngêhên Gramera Kurmancî*, ji berhevkirina: Arif Zêrevan, Ç: 1an, Çx: Ceylan Matbaasi, Weş: Nefel, Îstanbûl.
- Crystal. D (1992), *Anencyclopedia Dectionary of Language and Languages*, Blackwell.
- Crystal. D (2003), *A Dictionary Of Linguistics And Phonetics*, Fifth Edition, Blackwell Publishets, United Kingdom.
- Delal Ehmed Salih (2011), *Karîgerîya hokarîn Cografî Li Ser Dabeşbûna Zaran (Devera Behdînan Wek Nimone)*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Duhok, Duhok.
- Dîyar Ebdullkerîm Seîd Halo (2011), *Yasayên Dengî Di Kurdî ya Jorî Da (Gûvera Behdînan)*, Ç: 1an, Weş: Xanî, Duhok.
- Dulber Îbrahîm Ferec Şalî (2000), *Yasa Dengîyekanî Zimanî Kurdî* , Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Sulêmanî, Beşa Zimanê Kurdî , Sulêmanî.
- Ebdulla Ezîz Muhemmed (1990), *Guranî Watayî Wişe le Zimanî Kurdî da*, Teza Lîsansa Bilind, Kulêjî Adab , Zanîngeha Selaheddîn, Hewlêr.

- Ebdulla Husên Resol (2004), *Çend Pîtêkî Kêşedar Le Nosîni Kurdî da (Lêkolîneweyekî Dengsazîye)*, Govara Zanîngeha Duhok, Perbend 7ê, hijmar 1, Duhok.
- Ebdulla Husên Resol (2002), *Mêjûyî Şeweyî Germîyan Lêkolîneweyekî Zimanewanî Mêjûyî ye*, Govara Zanîngeha Duhok, Perbend 5ê, hijmar 1, Duhok.
- Ebdulla Peşew (2014), *Dîwana Hespim Hewrê û Rikêfim Çiya*, Ç: 4an, Çx: Rojhelat, Hewlêr.
- Ebdullezîz Elsîyex (2007), *Elmustlih Elsewtî fî Eldirasat Elerebîye*, Dar Elfikir, Dîmeşq.
- Ebdullqadir Ebdullcelîl (2006), *Elme'cem Elwezîfî Lîmebahis Îlim Eldelale El'am*, Ç: 1an, Dar Elsefa, Oman, Elordin.
- Ebdullsebor Şahîn (1993), *fî ElÎlm Elluxe Elam*, Ç: 6an, Moesese Elrîsale, Beyrot.
- Ebdullselam Necimeddîn Ebdulla û Şêrzad Sebrî Elî (2011), *Zimanwanîya Tîyorî*, Çx: Hecî Haşim Hewlêr, Weş: Dezgehê Spîrêz, Duhok.
- Ebdullselam Necimeddîn Ebdulla û Şêrzad Sebrî Elî (2018), *Fonetîk*, Ç: 1an, Çx: Hîvî Hewlêr, Weş: Dezgehê Nalbend, Duhok.
- Ebdullwahîd Muşîr Dizeyî û Yêdî Din (2013), *Fonetîk û Fonolojî*, Ç: 1an, Weş: Nawendî Awêr bû Çap û Bilawkirdinewe, Hewlêr.
- Ehmed Ebo Mehbob (1383/2004), *Saxtê Zebanê Farsî*, Ç: 3an, Çx: Tepîş, Tehran.
- Ehmed Muxtar (1976), *Dîraset Elsewt Elluxewî*, Alim Elkutub, Qahîre.
- Elî Ebdullwahid Elwafî (2004), *Îlm Elluxe*, Dar Elnehze, Misir.
- Elî Muhammed Heşînas (1383/2004), *Avaşinasî (Fonetîk)*, Ç: 9an, Muesesê û Întşarat Agah, Tehran.
- Ewrehmanê Hacî Marif (1976), *Zimanê Kurdî le Ber Roşinayî Fonetîk da*, Weş: Kûrî Zanyarî Kurd, Bexda.
- Ewrehmanê Hacî Marif (1986), *Nûsîni Kurdî be Elîfûbêyî Erebî*, Emîndarêtî Giştî Roşinbîrî û Lawanî Nawçey Kurdistan, Weş: Ela, Bexda.

Ferhenga *Le Petit Larrousse* (2009), Parîs.

Ferhenga *Le Petit Robert* (1993), Parîs.

Ferîde Cewado (2014), *Tecelîyat Zahire Eltexalîf fî Eldirasat Elerebîye*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Bicaye, Cezaîr.

Fewzî Hesên Elşayib (2004), *Esir Elqewanîn Elsewtîye fî Bîna Elkelîme*, Alim Elkutub Elhedîs, Ç: 1an, Erbed, Ordin.

Finch . G (2000), *Linguistic Terms and Conceots*, Machillan Prees L . TD.

Furank Nofo (2012), *Qamos Îlom Elluxe*, Wer: Salih Elmacirî, Ç: 1an, Elmunezime Elerebîye Lîltercume, Beyrot.

Hikûmeta Herîma Kurdistanê Wezaretê Pilandanan, Rêveberîya Amara Duhokê, Rêveberîya Zanyarî û Nexşesazîyê Pişka DEM , GAS, Pirofaylê Qezayan, Datayên Nebelavkirî

Îbrahîm Enîs (1971), *Eleswat Elluxe*, Ç: 4an, Dar Elanco Elmisrîye, Qahîre.

Îsa Wazih Hemîdanî (2015), *Elswt Elluxewî*, Ç: 1an, Dar Elxîda Lîlneşir we Eltewzî, Oman, Elordin.

Kawe Ferîq Şawelî Amêdî (2000), *Îmaret Badînan (1700-1842m) Diraset Sîyasîye – Seqafîye*, Ç: 1an, Çx: Xebat, Duhok.

Kemal Beşer (2000), *Îlm Eleswat*, Dar Elxerîb, Qahîre.

Krûş Sefewî (1380/2001), *Guftarhayê der Zebanşinasî*, Ç: 1an, Intşarat Hurmiz, Tehran.

Leyla Celîl Ebas (2003), *Nêr û Mê Le Zimanî Kurdî da (Be Keresey Jûrû û Xwarû)*, Teza Dukturayê, Zanîngeha Ibin Ruşd, Kûlêjî Perwerde, Bexda.

Lîyonardo Bilomfild (1397/2000), *Zeban*, Wer: Elî Muhammed Heqşinas, Ç: 1an, Çx: Muhammed Emîn, Neşrê Danişgahî, Tehran.

Maryo Pay (1998), *Osis Îlm Elluxe*, Wer: Ehmed Muxtar Omer, Ç: 8an, Qahîre.

Mehdî Mişkoheddînî (1377/1998), *Saxtê Avayê Zeban*, Ç: 4an, Întşaratê Danişgahê Fîrdewsî, Meşhed.

- Mehmûd Ekase (2013), *Eltehlîl Elluxewî fî Zew Îlim Eldelale Dîrase fî Eldelale Elsewîye we Elserfîye we Elnehewîye we Elmecemîye*, Dar Elneşir Lilcamîat, Misir.
- Mehmûd Elsu‘ran (1962), *Îlim Elluxe Muqedîme Lîlqri Elerebî*, Eskenderîye, Misir.
- Mêhrî Baqîrî (1380/2001), *Muqedimatê Zebanşinasî*, Ç: 4an, Neşîrê Qetrê, Tehran.
- Mêhrî Baqîrî (138/2001), *Vaçşinasî Tarîxîyê Zeban*, Çapa 1an, Neşîrê Qetrê, Tehran.
- Mobarek Xeqanî (2016), *Eltetewir Elluxewî*, Mucelet Eleser, Zanîngeha Qasidî Miebah Werqele, hijmar 4, Cezaîr.
- Muhemmed Elî Elxolî (1987), *Eleswat Elluxewîye*, Mektebet ELxerîcî, Elrîyaz.
- Muhemmed Emîn Hewramanî (1973), *Seretayek le Filolojî Zimanî Kurdî*, Weş: Mearîf, Bexda.
- Muhemmed Merof Fetah (1990), *Zimanewanî*, Dar Elhikme, Hewlêr.
- Nerîman Abdulla Xoşnaw (2013), *Dengsazî*, Ç: 1an, Weş: Rojhelat, Hewlêr.
- Neşwan Şukrî Abdulla û yê Din (2013), *Coxrafiyet Muhafizet Duhok (Dîraset Fî Elxesayîs eltebîye we Elbeşerîte Qeza Amîdî*, Duhok.
- Peyman Musa Sedî Bîrî (2016), *Kartêkirina Şêyana Fonolojîyê li Ser Numra Fêrxwazên Pola Pêncê Bineret*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Zaxo, Zaxo.
- Rebîh Emar (2007), *Bunye Elkelîme Elerebîye û Qewanîn Elewtîye*, Mucelet Elilom Elînsanîye, hijmar 11, Zanîngeha Mihemmed Xezîr bîsikre, Cezaîr.
- Remezhan Abdulltewab (1997), *Elmedxel îla Îlm Elluxe û Menahic Elbehîs Elîlmî*, Ç: 2an, Çx: Elxancî, Qahîre.
- Remezhan Abdulltewab(1997), *Eltetewir Elluxewî Mezahirhî we Îlelihî we Qewanînhî*, Çx: 3an, Mektebet Elxançî Lîltîbae we Elneşir, Qahîre.
- Remzî Mûnîr Belebegî (1990), *me‘cem Elmustelihat Elluxewîye*, Ç: 1an, Dar Elîlim Elmelayîn, Beyrot.
- Sadiq Bhaeddîn Amêdî (1987), *Rêzmana Kurdî Kirmanî Ya Jorî û Jêrî Ya Hevberkirî*, Ç: 1an, Bexda.

- Sasan Sipinta (1377/1998), *Avaşinasîyê Fîzîkîyê Zebanê Farsî*, Çx: Kuser, Weş: Gulha, Esfehan.
- Şebel Ewde Ebdulla Elluham (2010), *Dîrase Teqwîmîye Lîleswat Elluxewîye fî Menahic Elluxe Elerebîye fî Zew Elmeayîr Ellazime fîha*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Elîslamî, Filistîn, Xeze.
- Selaheddîn Seîd Husên (2009), *Eltexeyurat Elsewtîye fî Elterkîb Elluxewî Elerebî*, Teza duktûrayê, Zanîngeha Tişrîn, Sorîya, Laziqîye.
- Selam Nawxoş (2005), *Pûxteyek Drbarey Zimannasî Kurdî Mêjûyî Bûnyatgerî Çomiskî*, Ç: 1an, Weş: Çwar Çira, Hewlêr.
- Selwa Ferîq Salih (2017), *Etlesa Fonolojîya Parêzgeha Duhokê*, Ç: 1an, Çx: Kalkan Turkîya, Weş: Dezgehê Spîrêz, Duhok.
- Şêrzad Sebrî Eli û Ebdullselam Necimedîn Ebdulla (2019), *Fonolcî*, Çx: Hîvî Hewlêr, Weş: Dezgehê Nalbend , Duhok.
- Seyid Mêhdî Sucadî û Alîgerd Zeferanlo Kambozîya (1393-2014), *Ferayendêhayê Vajêhayê Muşterek Beyê Zebanê Farsî û Miyar Zebanê Horamî (Gevîşê HoramanText)*, Fesilnamê Mutaliatê Zeban û Gevîşhayê Gerbê Îran, Danişkedê Edebîyat û Ilomê Insanî, Salê Evel, Şumrê 40, Danişgahê Razî Kirmanşah.
- Talîb Husên Alî (1989), *Fonolojî Kurdî û Dîyardeyî Asanbûnî Fonîmekan le Zarî Sulêmanî da*, Teza Lîsansa Bilind, Kûlêjî Adab Zanîngeha Selaheddîn, Hewlêr.
- Talîb Husên Alî (2015), *Dengsazî Çend Babetêkî Fonolojî Kurdî* , Ç: 1an, Weş: Rojhelat, Hewlêr.
- Wehîd Sefye (2009), *Eşkal Eltebdîlat Elsewtîye fî ELLuxat Elsamîye*, Mucelet Cmîet Tişrîn Lîlbhos Elîlmîye, Elmucelet 31, hijmar: 1, Sorîya, Laziqîye.
- Wirya Omer Emîn (1982), *Îmlayî Kurdî û Çend Têbînîyek*, Govara Kûrî Zanyarî Îraq Destey Kurd, hijmar 9, Bexda.
- Wirya Omer Emîn (1984), *fonolojî*, Govra Karwan, hijmar 20, Emîndarî Giştî Roşinbîrî û Lawan, Hewlêr.

Zeyneb Mexloqî (2011), *Eltedaxil Elluxewî fî Elerebîye*, Teza Lîsansa Bilind,
Zanîngeha Elmentorî, Cezaîr.



Xiște

XIȘTÊ 1 DABEȘKIRINA DENG DARAN	17
XIȘTÊ 2 DABEȘKIRINA DENG DÊRAN.....	18



Hêlkarî

HÊLKARÎYA 1 DENGÊN ZIMANÎ Û NE ZIMANÎ	3
HÊLKARÎYA 2 FONÎM Û ELOFON	10
HÊLKARÎYA 3 PEYWENDÎYA DI NAVBERA FONÎM Û DENG Û ELOFONÊ	11
HÊLKARÎYA 4 ASTÊ GUHERÎNA PEYVAN	33



Nexşe

NEXŞÊ 1 DEVERDARÎYA AMÊDÎYÊ	36
-----------------------------------	----



Jîyanname

Tahseen Mamo Aziz li sala 1984an de li civakgeha Şêladizê ser bi deverdarîya Amêdîyê ji dayîk bûye, perwedeya xwe a sertayî û navincî û amadeyî li Şêladizê bi dawî anîye, li sala 2004an de çoye kolîja perwarda Sûran ser bi zanîngeka Selaheddîn beşa ziman û edaba Kurdî , li sala 2008an de bi dawî anîye, û li Adara sala 2009an de bi fermî hatîye damezrandin li wezareta perwerdê weke mamostayê ziman adeba Kurdî , û ta niha berdewame li ser karî xwe.





VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

LİSANSÜSTÜ TEZ ORJİNALLİK RAPORU

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü



09/09/2019

Tez Başlığı / Konusu

**GUHERİN Dİ ASTA DENGSAZİYÊ DE
-WEK MÎNAK DEVERA AMÊDİYÊ-**

Yukarıda başlığı/konusu belirlenen tez çalışmamın Kapak sayfası, Giriş, Ana bölümler ve Sonuç bölümlerinden oluşan toplam 90 sayfalık kısmına ilişkin, 09/09/2019 tarihinde şahsım/tez danışmanım tarafından % 1 intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtreleme uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı % 1 (Yüzde Yedi) dir.

Uygulanan Filtreler Aşağıda Verilmiştir:

- Kabul ve onay sayfası hariç,
- Teşekkür hariç,
- İçindekiler hariç,
- Simge ve kısaltmalar hariç,
- Gereç ve yöntemler hariç,
- Kaynakça hariç,
- Alıntılar hariç,
- Tezden çıkan yayımlar hariç,
- 7 kelimedenden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç (Limit match size to 7 words)

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Lisansüstü Tez Orijinallik Raporu Alınması ve Kullanılmasına İlişkin Yönergeyi İnceledim ve bu yönergede belirtilen azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içemediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Gereğini bilgilerinize arz ederim.

09/09/2019

Tahseen Mamo Aziz Aziz
Adı, Soyadı, İmza

Adı Soyadı : Tahseen Mamo Aziz Aziz

Öğrenci No :17950001001

Anabilim Dalı : Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Programı : Örgün Eğitim

Statüsü : Y. Lisans Doktora

DANIŞMAN
Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

09/09/2019

ENSTİTÜ BAŞKANI
GÜNDEMİR

09/09/2019
Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ
Anabilim Dalı Başkanı